Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1355 1-Adar-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Êşa nexweşan û temenmezinan li stargehan girantir dibe

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Kal û pîrên koçber hewceyî lênêrînek taybetî û şert û mercên jiyanê yên guncaw in. Girîng e rastiya wan a tenduristî, civakî û mirovî were fêmkirin, ji ber pirsgirêkên ku ew pê re rûbirû ne, bandorê li jiyana wan a rojane dikin, lewma ew hewceyê baldariyek mezintir in.**



Pêlên dubare yên koçberiya bi darê zorê ji ber êrîş û bombebarana berdewam, bi hezaran malbat neçar kirine ku malên xwe biterikînin û li dibistan û avahiyên giştî yên ku veguherîne stargehên demkî li stargehek ewle bigerin. Vê koçberiyê bandorek mezin li kal û pîr û nexweşan kiriye, ku bêyî lênêrîna bijîşkî ya birêkûpêk an piştgiriyek têrker bi pirsgirêkên girîng ên tenduristî û jiyanê re rû bi rû ne.

Di vê çarçoveyê de, berpirsekî yek ji stargehên ku koçberên ji Efrîna dagirkirî lê dimînin, piştrast kir ku gelek kesên pîr ji nexweşiyên zehmet ên wekî nexweşiya dil, şekir û tansiyona bilind dikişînin, lê belê ti aliyekî peywendîdar destwerdan nekiriye da ku piştgiriya bijîşkî ya têrker ji wan re peyda bike. wî destnîşan kir ku Heyva Sor a Kurd tenê carekê serdana nexweşan kiriye, lê navend çar kesên temenê wan di navbera 60 û 70 salî de ne ku ji van nexweşiyan dikişînin, ji ber vê yekê ew pir hewcedarê lênihêrîna tenduristiyê ya berdewam û şopandina bijîşkî ya bi awayek dewerî in. Ev jî cihê serbilindûnê ye weke ku tê dîtin ên temen mezin ji xwe re hemû ezmûn ceribandine.

**Koçberiya bi zorê û bandora wê li ser tenduristiyê**

Di serdana yek ji dibistana ji xwe re wek stargeh dibînin li Qamişlo de, Reşîd Mihemed Mûsa, koçberekî ji bajarê Efrîn, vegot ku ji sala 2018"an vir ve çar caran koçber bûye û wiha got: "Ji ber westandin, tirs û şert û mercên dijwar, di dema rêwîtiya me de nexweşiya dil bi min re çêbû û neçar man ku bêyî pereyên pêwîst biçim nexweşxaneyê. Bi kerema Xwedê, ez karîbûm muayeneyek belaş ji bijîşk bistînim. Malbata, min ya ji neh kesan pêk tê, di zehmetiyên mezin de me, ji ber ku hevjîna min ji ber sermaya dijwar û şert û mercên koçberiyê ji ber kêmbûna bihîstinê dikişîne, ev yek jî me bi berdewamî bi derman û muayeneyên bijîşkî hewce dike. Di heman demê de hevjîna min hewce dike ku emeliyatek vekirina damaran bike, lê rewşa psîkolojîk û ewlehiyê û zexta darayî nahêle ku ew vê yekê bike, nemaze ji ber ku lêçûna emeliyatê digihîje nêzîkî 50 milyon lîreyên Sûrî, ku ew di şert û mercên heyî de nikare peyda bike. Rewşa tenduristiya min jî hewceyê çavdêriyek domdar e, ji ber ku ez ji êşa singê jî dikişînim, ku heke neyê dermankirin jiyana me di xetereyê de ye. Niha jî, em bi tenê xwe dispêrin dermanên ku ji dema gihîştina me ya navendê ve ji me re hatine dayîn."

Di dawiyê de, kesê koçber Reşîd Mihemed Mûsa hêviya xwe ya vegera bi ewle ji bo erd û mala xwe, bê tirs û fikar, piştî salan koçberiya bi darê zorê ya berdewam anî ziman.

## Gotina Dawî



### Adar û Barê Kurdan ê giran!

**Mihemed Seydi**

Em ketin meha Adarê ku ji bo Kurdan hatina vê mehê bi Newroz û Bûharê navdare. Ji bo Kurdan meha nû û sala nû û jiyana nû bi Adarê dest pê dike. Ji ber bi germahiya Adarê re dawî li reşayîyê, zilm û zorê tê. Bi Adarê re roj dirêj dibin û şev kin, ronahî zêde dibe û reşayî kêm, lê ev Bûhar ne wekî yên beriya xwe ye. Em ketin meha Adarê û birînên Kurdan hîne jî nehatine dermankirin. Hîne dor li Kobanê girtiye, Efrînî hîn Koçberin, Serêkaniyê bê xwediye û Kurd di halekî westiyayî de ne. Ne ji ber ku Kurd bê hêvî ne, lê barê wan giran e û berdêlên ku dane giranbûhane.
Ev zêdetirî mehekê ye ku bajarê Kobanê di rewşeke giran de ye û dor lê hatiye girtin. riyên vî bajarî hatine birîn û bi bêdengî dixwazin nefesê lê bibirin. Herwiha zarokên Kurdan ên di destê çekdarên HTŞ'ê de ku bûn êsîrê bêbextiya hin eşîrên Ereb û him jî bûn qurbana bêwijdaniya hêzên navdewletî, kezeba dayik û bavan li ser dişewite. Aliyekî koçberên Kurd ku hinek ji wan li nava dibistanên Qamişlo û Kobanê de belav bûne û hinek jî li nava kolanê bajarên Sûriyê bê serûber bûne.
Tevî vê rewşê jî, van Kurdan hîne jî hêviyên xwe wenda nekirine. Lê berpirsyariya zêde divê li ser milê kê be? çima ji gelek rastiyan re çav tên girtin û bi dengekî bilind gotin nayê kirin? Vekşîna ji Şehba û pêre ji Minbic û paşê ji Reqqa û Dêrazorê di berdêla çi de bûn? Gelo bêbextî ji aliyê hêzên Koalisyonê ve hat kirin? Wê demê gotina ku divê mirov pala xwe bide hêza xwe û miletê xwe li ku ma? Çima bi daxuyaniyeke çapemeniyê nehat gotin ku bi sedan Kurd li Şêxmeqsûd û Şehba û Reqqa û Dêrazorê ji aliyê DAIŞ û HTŞ û çekdarên di bin navê Eşîrên Ereb de dîl hatin gitin û li Kobanê mal û malê Kurdan wekî xenîmet hate dîtin û talankirin? Çima bi zelalî ji raya girtî re nehat gotin ka çi qewimî û çi diqewime? Bi ya min, ew berpirsyarî ya kesên ku erka rêvebirinê girtine ye û ne ya hemû kesî ye. Erê raste, Kurd hemû di yek keştiyê de ne, lê her kes ne rêvebere. Raste ku hevseroka Daireya Karên derve ya Rêveberiya Xweser Îlham Ehmed berî çend rojan eşkere kir ku bi sedan Kurd êsîrin di destê komên HTŞ'ê de, lê ew tenê wekî hevpeyvîneke şirovekirina rewşê bû û ne bangewaziya ji bo raya giştî bû. Her wiha li Civîna Munîhe çi bû li naveroka civîna çi bû û ji bo Kurdan çi hebû, ew jî bi zelalî nehat gotin û agahî nehatin parvekirin Piştî wê, Fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdî li SIlêmaniyê wekî şandeyekê tevî serokê YNK'ê Bafil Talabanî bi nûnerê taybet ê Trump li Sûriyê û Îraq û Tirkiyê re civiyan û wêne jî hatin parvekirin, lê gelo mijar çiqasî Kurdan eleqedar dike û derbarê çarenûsa wan de çi hate gotin, dîsa nehatin agahdarkirin. Raste ku hin naverokên civîn û hevdîtina nabin werin gotin, lê nabe miletê Kurd jî di nava xeyalên wî yên bi wêneyekî kêfxweşiyê mezin dibe û dîmenekî aciziyê li latan dikeve re were hiştin. Lewma, ji kesên ku erka rêvebirinê gitine ser milê xwe, ku miletê Kurd jî li Rojava pê bawerin, tê xwestin raste rast xitabî milet bikin û bibêjin ka wê çi bibe û ew ê çi bikin. Wê baştir be ku di asta jor de rojane daxuyanî li ser dosya talankirina malên Kurdan, dorpêçkirina Kobanê û dîlên di destê komên çekdar de were dayîn.

## FERHENGA BIWÊJAN

Erd girtiye:
- Pîr û kal bûye, êdî nikare bimeşe.
Ez ne yên van salan im:
- Ez bitemen im.
Ezê keziyên reş û spî ser hev re biavêjim:
- Ezê xwe pîr bikim û ez mêr nakim.
Ezê keziyên reş û spî bi ser hev de bihonim:
- Bi heman wateyê.
Fişekên wî nemane:
- Bi heman wateyê.
Hesteyê wî êdî agir jê naçe:
- Hêz pê re nemaye; pîr bûye.
Ji ba ketiye:
- Kal bûye; êdî nikare kar bike.
Ji ta û ba ketiye:
- Extiyar bûye, êdî nikare tiştekî bike.
Ji dest xwe çûye:
- Pîr û kal bûye.
Ji qûnê kat daye:
- Bi heman wateyê.
Lingekî wî li ser gorrê ye:
-Pir extiyar bûye; hindik maye bimire.
Lingek li vê dinê ye yek li wê dinê ye:
- Bi heman wateyê.
Lingek li dinê ye, yek li axretê ye:
- Bi heman wateyê.
Mûyên qûna wî spî bûne:
- Temenê wî pir li jorê ye.
Mûyên spî ketine serê wî:
- Pîr bûye.
Nîr di aliyê gayê pîr de xwar dibe:
- Kesên bitemen kar xirab dikin.
Şaxên wî sê çar caran zîvirîne:
- Pîr bûye; gelek sal derbas bûne.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Bi kamîreya ronahî


Efrîn

## Zubeyde Zumrut: Divê zagonên pêvajoyê werin çêkirin



Hevseroka KCDK-E Zubeyde Zumrut diyar kir ku eger dewleta Tirkiyê dixwaze bi Kurdan û hemû gelên din re bi aştî jiyan bike, yek ji pîvanên bingehîn ew e ku şert û mercên demokratîk qebûl bike û got, "Komîsyona ku li ser vê bingehê hatiye avakirin, dive di çarçoveya zagonî de guhertinên demokratîk pêkbîne."**R-4**

## Gefên li Iraqê û amadekariyên leşkerî yên li derdora Şengalê



Piştî şerê Rojavayê Kurdistanê xuyaye dixwazin berê xwe bidin Iraqê û bi taybet gelê Kurd, Hakan Fîdan got: "Piştî Sûriyê dora Iraqê tê". Di van demên dawiyê de zelal e ku dixwazin fermaneke nû li ser Civaka Êzidî li Şengalê rakin ku hikumeta Iraqê derdora Şengalê amadekariyên xwe yên leşkerî dike.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1355 1-Adar-2026 www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S

## 'Yekrêziya partiyên Rojhilatê Kurdistanê pir girîng e, divê berfirehtir bibe'



Hevserokê KNK'ê Ehmed Karamûs da zanîn ku yekrêziya partiyên Kurdî yên Rojhilatê Kurdistanê di rewşeke hestyar û amadekirina êrişan li ser Îranê pir girng e, lê divê ji wiha berfirehtir bibe û got, "Li ser asta Kurdistanê pêdivî bi rêkeftin û pêkanîna kongreyeke niştîmanî heye."**R-6**

## Meha rojiyê sebra mirov zêde dike



Hevserokê Ol û Bawerî Mistefa Hacî diyar kir ku rojî tê wateya bereket û îbadetê, mirov ji aliyê nefsî, xwerin û vexwerinê de hem jî ji axaftinên nebaş xwe perwerde dikin û wiha got: "Meha rojiyê sebra mirov zêde dike û dilovaniyê dixe dilê me de." **R-7**

# DI SIBEROJA SÛRIYÊ DE WÊ YPJ'Ê NASNAME Û XWESERIYA XWE BIPARÊZE

Endama Fermandariya Giştî ya YPJ'ê Sarya Efrîn diyar kir ku her çiqasî hikumeta demkî ya Sûriyê hebûna jinan di qada leşkerî de dixwaze tenê bi Hêzên Ewlekariya Hundirîn û sînordar bike, herwiha di hevdîtinên heyî de hebûna YPJ'ê di nava artêşê de, ne bi awayekî erênî ne jî neyînî nebersivandiye, lê wê YPJ'ê di nava tugayên ku werin avakirin de cihê xwe bigrin. Di siberoja Sûriyê de wê YPJ'ê nasname û xweseriya xwe biparêze.**R-2**



## 'Êrişên dijî Rojava rê li pêşiya Şevçirayên Rojava girt'



Cîgirê serokê HRRK'ê Mistefa Ebdo da zanîn ku rewşa ewlehî û êrişên dijî Rojava bûn sedem ku çalakiya Şevçirayên Rojava neyê lidarxistin û got, "Şevçirayên Rojava çalakiyeke girîng e ji bo wêjeya Kurdî. HRRK'ê bi çalakiyên xwe hewl dide rêwîtiya karê netewî bidomîne."**R-9**

Divê em Rojava, şoreşa jinan, nirxên şoreşa jinan biparêzin
Îsyan Karadeniz R-2


Rast xwendina Peyama Rêber Apo
E.Pêjder Altan R-6


Meha Remezanê
Hafiz Ahmet Turhalli R-7

# Sarya Efrîn: YPJ'ê wê nasname û xweseriya xwe biparêze

Endama Fermandariya Giştî a YPJ'ê Sarya Efrîn diyar kir ku her çiqas di hevdîtinên heyî de hikumet hebûna YPJ'ê di nava artêşê de, ne bi awayekî erênî ne jî neyînî nebersivandiye, lê ew ê di nava tugayên ku werin avakirin de cihê xwe bigrin û got, "Yek şervan û fermandarên YPJ'ê gav paşve avêtinê û tawîz dayînê qebûl nakin."

**Ronahî Sadûn**



Derbarê rewşa dawî ku li herêmê rû da, herwiha girêdayî lihevkirina 29'ê Çileyên û çawaniya pêkanîna entegrasyona YPJ'ê, endama Fermandariya Giştî a YPJ'ê Sarya Efrîn bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**- Piştî rewşa dawî ya ku li herêma me rû da, lihevkirinek di navbera QSD'ê û hikumeta Demkî de di 29'ê Çileyê de pêk hat, hûn vê lihevkirinê û rewşa dawî ya herêmê çawa dinirxînin?**

Herêma Rojhilata Navîn di pêvajoyeke parvekirin û dîzaynkirineke nû re derbas dibe. Lê hêzên hegemon ji peymanên ku beriya 100 salî çêbûbûn, hîn jî ne razîne. Ji ber wê jî di nava vê 100 salê de aramî nehate heremê, her tim gengeşe û şer berdewam kir. Di vê serdemê de her kes dixwaze ji vê guhertinê para xwe bigire û daxwazên xwe li ser rewşê ferz bike. Di vê pêvojoyê û beriya wê jî yek aliyê ku tine hatibû hesibandin û qet berçav nehatibû girtin jî, Civaka Kurd bû. Lê di roja me de kes nikare Kurdan derçav bike. Ev êrişa hatiye kirin jî armanca sereke lewazkirina hêza Kurd bû. Ev êriş ne êrişeke tenê li ser Bakur-Rojhilatê Sûrî û Rojava bû. Ev êriş heman demê êrişeke li ser statuya Kurd ê li Iraqê jî bû. Ji xwe Rêber Apo, di derbarê wateya êrişan de wiha dibêje: 'Ev êrişeke li hemberî pêvajoya bi dewleta Tirk re daye destpêkirine û mîna Komploya 15'ê Sibatê yê û tevahî Kurdan dike hedef'. Li hember êrişeke wisa berfireh Civaka Kurd û dostên xwe ketin nava tevgerê, her çar parçayên Kurdistanê weke yek dil û yek beden tevgeriyan û sînorên dagirkeriyê yên fîzîkî ji holê rakirin û derbasî Rojava bûn. Kurd û dostên Kurdan li her derê daketin qadan. Heman deme de şervanên QSD, YPG û YPJ'ê berxwedaniyeke dîrokî raber kirin. Encam de hate destnîşan kirin ku ketina Rojava ne hêsane û encama neyînî pêşbikeve, wê berdelên wê jî giran bin.

Li rex vê di Navnetewî de jî bertek çêbûn, ji ber plan ew bû ku di nava çend rojan de herêmên me werin girtin û sînorê Iraqê de serweriya HTŞ' çêbibe. Li gor hin kes analîz dikin, wê ev hêza HTŞ' ji bo êrişa li ser Haşd El-Şabî were bikar anîn. Ji bo wê jî Iraq li ser sînor tedbîrên awarte digire. Lê berxwendaniya Rojava hemû hesabên heyî berovajî kir. Peymana 29'ê Çilê di astekê de ji bo Şoreşa Rojava xwedî naverokeke erêniye û gelek destkeftiyên gelê me jî diparêze. Lê mirov nikare vê misoger bike, ji ber îhtîmala êriş û şer hîn jî holê ranebûye. Sedema esasî jî ew e ku zîhnîyeta hikumeta heyî xwedî kiryarên tundrewe. Bi gotineke din em di rewşa heyî de nikarin bêjin, ji ber ku guhertina feraset di hikumeta Şamê de carekî de pêk hat û bi vî awayî ev peyman qebûl kirin. Ev peyman di encama zexta navnetewî û berxwedaniya Şoreşa Rojava de hate qebûl kirin. Dema ev zext ji holê rabe, dibe ku dîsa kiryarên xwe bidomînin. Ji bo vê pêwîst e her tim zext li ser Şamê berdewam bike, da ku ev peyman bi tevî naveroka xwe bikeve destûra bingehîn û li kêleka wê pêwîst e saziyên navnetewî jî vê bişopînin. Li heremê rewşa dawî aniha mirov dikare bêje heya astekê asayî bûye. Lê dorpêça li ser Kobanê hîn jî didome, nêzîkatiyên ku ji aliyê hikumeta Şamê ve tên raberkirin, lihevkirinên heyî de di warê gavên pratîkî avêtinê de astengiyan çêdike. Hikumeta Şamê gavên ku diavêje, gelek girane. Ev yek deriyê gûmanan vekirî dihêle. Niha di rewşa heyî de hevdû bawerkirineke dû aliyî hewcedariyeke demildeste. Em weke QSD û YPJ di vê xalê de gelek baldar tevdigerin, da ku aramiya li herêmê mayînde bibe, ji bo pergala rêveberina civakî êdî ji bo gel bikaribe xizmetê bike.

**- Li gorî lihevkirina 29'ê Çileyê wê hêza Jin YPJ'ê çawa cihê xwe bigre, ango entegrasyon wê bi çi rengî be?**

Di van 15 salên derbasbûyî de jinan gelek êş kişandin û berdelên giran dan. Ev hemû ji bo azadiya jin û civakê hate kirin û îro weke temsîla jina azad YPJ'ê ji vê ne poşmane û em li ser vê xeta lehengiyê di meşa xwe de bi israrin. Piştî ewqas şehadet û ked em dest ji armancên xwe bernadin, em xwedî pîvanên exlaqî ne. Yek şervan û fermandarên YPJ'ê jî gav paşve avêtinê û tawîz dayînê qebûl nakin. Herwiha jina ku azadî û nasnameya xwe di nava refên YPJ'ê de dîtiye, xwedan biryara têkoşînê ye. Ji bo wê weke YPJ'ê em ê nasname û xweseriya xwe biparêzin. Di rêgezên birdoziya azadîxwaziya jinê de, jin di hemû qadên jiyanê de xwedî mafe, di qada parastinê de jî xwedî heman mafê wekhev ya bi mêr re ya.

Li ser vê bingehê her çiqas di hevdîtinên heyî de hikumet hebûna YPJ'ê di nava artêşê de, ne bi awayekî erênî ne jî neyînî nebersivandiye, lê em ê di nava tugayên ku werin avakirin de cihê xwe bigrin. Di heman demê de di fermandariya tugayan de jî em xwedî kabîlîyeta femandane ku em ê li ser vê bingehê jî cihê xwe bigrin. Weke me diyar kir wê hebûna me di nava tugayan de, bi awayekî hemaheng bi hejmara giştî re di nava tewazûneke de be. Her çiqas hikumet hebûna jinan di qada leşkerî de dixwaze tenê bi hêzên ewlekariya hundirin ve sînordar bike jî. Lê weke YPJ'ê em xwedî biryarin ku bi QSD'ê re heman astê û naverokê, da destkeftiyên gelê xwe biparêzin, ji xwe heta niha jî xebatên me yên entegrê bi vî awayî tên meşandin.

**- Ji bo entegrasyona tê kirin çi xebat hatiye meşandin û di çi astê de ye?**

Ji bo entegrasyonê, hêzên leşkerî xwe ji xeta temasê kişandin û dewrî hêzên asayişê hate kirin. Li gel vê jî amadekariyên tugayan tên kirin û demeke kurt de wê hêzên me bi wezareta parastinê re bi awayekî koordînelî xebat bidin meşandin. Sazî, heyet û hêzên hikumeta Şamê derbasî herêmên me bûn, da ku em bi hev re bi awayekî koordînelî xebatên entegrasyonê çavderî bikin. Helbet derbasbûna van hêzan di bin venerîna me de ye, heta demeke kurt di vê çarçoveyê de wê li herêmên me bin. Ev hêzên derbas dibin ne mayin de ne, her hêz ew ê rewşa saziyên girêdayî xwe çavderî bike û vegerin cihê xwe ango li heremên me namînin.

Niha mijarên herî girîng û sereke di aliyê pergala rêveberina civakê de ye. Di vê mijarê de pêwîst e ev peyman û entegrasyon di asta qanûnî de jî were destgirtin ku ne tenê di gotin de be. Ji bo wê xebat lazime, lê Şam pêwîst e di vê mijarê de baldar û bi gavên lez tevbigere. Destûra bingehîn de ji mafê hemwelatîbûnû heta ziman û perwerdehiyê xalên girîng û jiyanîne ku pêwîst e bi qanûnan re bikevin bin ewlehiyê, da ku baweriya gelê me pêş bikeve. Yek jî mijara esasî vegera gelê me yê koçber li cih û warê xwe ye, ji bo vê komîsyonên hevbeş hatine rêxistin kirin û niha xebatên xwe dest pê kirine. Di vegera gelê me de xala herî esasî ewlehiya gelê me xistina bin garantiyê de, ji ber heger em ewlehiya gelê xwe garantî nekin, bi tu şêwazî gelê naxin nava xeteriyê. Di vê çarçoveyê de wê xebatên me bidome.

**- Gelo wê tu guhertin hebe, eger hebe jî wê çawa be?**

Hemû têkoşîna ku me heta roja îro da meşandin, ji bo ku pirsgirêka gelê me bi temamî were çareserkirin, hate meşandin. Pirsgireka bingehîn jî ew e ku weke netewa Kurd em xwedî dîrokeke berxwedanê ne, me ji bo bi destixistina mafê netewî gelek serî hildaye û şer kiriye. Ji ber wê jî ji vê seetê şûndatir guhertin şerte, ji xwe ev guhertinên ku çêbibin li hemberî rastiya gelê me ye fedakar û berxwedêr gelek dereng jî mane. Guhertin helbet hemû qadên jiyana civaka me digre nava xwe de.

Piştî şerê navxweyî heta îro me xwe di nava aloziya heyî de li ser piyan girt û me di cîhanê de jî cardin hêviya jiyaneke azad afirand. Têkoşîna me weke her civakeke ji bo bidestxistina mafê jiyaneke wekhev û azade. Di encama berdêlên ku me daye de, em di wê biryardariyê dane ku di destkeftiyên şoreşê de, em gav paşde navêjin. Em ê heremê xwe di her alî de bi rêve bibin. Destwerdana derve em qebûl nakin. Ango anha çawaye, wê wisa berdewam bike. Tenê niha temsîliyeta Şamê li heremên me nîne, lê ew ê jî demên pêşiya me çêbibe. Ango hemû saziyên me wê bi Şamê re di nava ahengiyê de karên xwe berdewam bikin. Gavên li pêş me bi taybet di warê qanûnê de ne, mînak ji bo ku mafê hemwelatîbûnê ji gelê Kurd were dayîn, li bajaran navendên serlêdanê hatin vekirin. Armanca me ev e ku di her werî ne tenê weke gelê Kurd hemû taybetmendiyên gelên ku li herêmê jiyan dikin, bi destûreke bingehîn ya fireh re ji nû ve were destgirtin. Dema ev yek were kirin, ji siyasetê bigrin heta artêş ji xwe wê hem bermahiyên desthildariyê bêbandor bin, heman demê de wê li pêşiya desthildarên nû jî were girtin. Bi vî rengî wê civaka me jî di nava wekheviyê de bijî.

**- Di dawiyê de bang an daxwaziya we çi ye?**

Ji bo parastina destkeftiyên şoreşa ku me di oxira wê de gelek leheng feda kirin, têkoşîneke yekgirtî wê qedera gelê me biguhere. Bi taybet wek jin xwe rêxistinkirin û zanekirinê re, di avabûyîn û pêşxistina pergala nû de rola me heyî hîn zêdetir berbiçavtir dibe. Ji bo wê jî xwedî li erkên xwe yên demê derketin girînge. Ger em dixwazin weke gel xwedî li nasname, hebûn û mafê xwe derbikevin, di qada parastinê de cihê xwe bigrin. Li ser esasê parastina cewherî tevgerandin di vê pêvajoyê de mijareke sereke ye. Em bang li ciwanên Rojava dikin, ji bo pêşoroja xwe bi ewle bikin, xwedî li deskeftiyên şoreşê derbikevin û di pêşxistina wê de jî cihê xwe bigrin. Gelê me pêwîst e di rewşa heyî, di rewşa şer de heta roja îro çawa li kolanan nobeta taxên xwe digrin, bi baweriyeke bêhempa têkoşîn dikin, ev sekna xwe ye îfadeya rûmete ye, biparêzin û rêxistinbûna xwe xûrttir bikin.

Misogeriya şoreşan bi biryardariya gelan re tê bidestxistin. Ji hemû beşên civakê ji bo azadiya hebûnê, têkoşîn bike, elbet wê berxwedanî bi serkeftineke mayînde re tacîdar be. Gelê me dît ku şervanên wan yanî zarokên wan di eniyên berxwedanê de, di çeperên şer de dema li hemberî dagirkeriyê şer dikirin, can feda kirin jî gotina dawî gotin 'Em rexne dayîna xwe didin' pêwîst e ev ruhe bilind yên şehîdên me, bibe sedema herî esasî ya têkoşîna me ya azadiyê. Ev ruhê ku îfadeya herî bilind ya fedakariyê ye, biryardariya me ye serkeftinê nîşanî tevahî cîhanê da.

## Akademiya Jîneolojî

### Divê em Rojava, şoreşa jinan, nirxên şoreşa jinan biparêzin

**İsyan Karadeniz**

Di seranserê dîrokê de, her êrîşek li ser destkeftiyên jinan pêşî bi rêya nîqaşên exlaqî û olî rewa bûye. Ji nêçîra cadûyan bigire heta berxwedana jinan li Îranê, û heta pratîkên Talîbanê li Afganistanê, heman senaryo dubare bûye. Nêzîkatiyeke ku pêşî jin bêdeng dikin, paşê civak tê tepeserkirin. Lê li Rojava, ji ber ku jin nehatine bêdengkirin, civak nehatiye tepeserkirin. Ji ber ku dema jin azad dibin, civak demokratîktir dibe; dema ku jin tên girtin, civak dikeve nav taritiyê.

Ne tesaduf e ku HTŞ û serokê wê yê qaşo Colani di êrîşên xwe yên li ser Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê de jinan hedef girtine. Ev hilbijartinek îdeolojîk e. Ji ber ku jin ne tenê avahiyek leşkerî an jî pêkhateyek siyasî li dijî wan in. Ew bi şoreşek civakî re rû bi rû ne ku li ser mijara jinan hatiye avakirin. Û di forma herî rêxistinkirî, herî hov, herî sîstematîk, herî tarî ya hişmendiya serdest a mêran de, ji vê mezintir gef tune ye. Dema ku em li pratîkên HTŞ ê yên li dijî jinan dinêrin, em bi rastî vê wêneyê bi zelalî dibînin. Nenaskirina YPJê, dayîna mafê xebatê ji jinên ku di ewlehiyê de dixebitin re têne heke ew zewicî bin, veguherandina olê bo amûrek kontrola siyasî bi rêya belavkirina Quranê li Reqa û Tepqayê ji derî bi derî, ferzkirina serpoşên mecbûrî, dijberiya derketina jinan bi tena serê xwe, an dijberiya perwerdehiya bi zimanê dayikê yê Kurdî.

Ev hemû xal hilbijartinên çandî ne, ango em dikarin wan wekî bernameyek bi zanebûn hatî hilbijartin jî bi nav bikin ku armanc îradeya jinan ji holê rakirin e. Ji ber vê yekê ew çima ji jinan ditirsin? Ji ber ku li Bakur-rojhilatê Sûriyeyê, jin ne tenê bûne xemlên pergalê, lê ji bo cara yekem bûne damezrînerên wê.

Bi pergala hevserokatiyê, jin ne tenê bûne nîvê mekanîzmayên biryardana siyasî, lê di rastiyê de bûne aktorên bingehîn ên ku wan diyar dikin. Wan xwe birêxistin kirin da ku edalet û aboriya xwe bi rêya saziyên jinan biparêzin. Ev pir girîng e, pir watedar e; ji bo vê yekê têkoşînên mezin hatin dayîn. An jî, bi jineolojiyê re, wan dest bi ji nû ve nivîsandina zanînê kirin bi azadkirina wê ji vegotina dîrokî ya navend-mêr, û ev di warê şoreşê de bi rêya keda jinan hate bidestxistin.

Ji perspektîfeke jineolojîk ve, em sê stûnên bingehîn ên pergala serdestiya mêran dibînin: Desthilat, milk û zor. Ji ber ku hebûna jinan di qada giştî de yekîtiya hêzê dişkîne. Ji ber vê yekê, ew YPJ qebûl nakin. Ji ber ku gef û xetera herî mezin ji bo pergala serdestiya mêran parastina jinan e. YPJ û HPC jin li Rojava, li Bakurê Rojhilatê Sûriyeyê pêk hatin. Hebûna YPJ ne tenê hêzek leşkerî ye, lê di heman demê de îlankirina paradîgmayê ye ku jin ne yên ku hewceyê parastinê ne, lê yên ku xwe diparêzin in.

HTŞ dixwaze jinan nedîtî, bêdeng û bê nasname bike. Ev êrîş ne tenê li dijî jinên Kurd in, ev êrîş li her cihê ku jin dibin mijar têne kirin. Divê em vê yekê rast bixwînin û analîz bikin. Şoreşa jinan li Rojava ne tenê ezmûnek herêmî ye, lê di heman demê de dijwariyek gerdûnî ye ji bo pergala baviksalar, û HTŞ ji vê dijwariyê ditirse. Îdeolojiyên dijminane yên li dijî jinan sînor nas nakin. Dibe ku zîhniyeta ku îro êrîşî saziyên jinan ên li Rojava dike sibê li welatekî din bi navekî din derkeve holê. Ji ber vê yekê dîrok dersekê dide me, dibe ku dîrok şansek dawî dide me.

Niha dem hatiye ku ezmûn, têkoşîn û hevgirtina jinan zêde bibe. Dem hatiye ku şoreşa jinan were parastin, dem hatiye ku hevgirtinek were avakirin ku sînoran derbas dike. Ji ber ku ger azadiya jinan neyê parastin, ti azadî nikare bijî, ji ber vê yekê, divê em rêxistin bikin, divê em têkoşînê berfireh bikin.



# Remezana Sûdanê di nava hêvî û birçîbûnê de ye

Remezana îsal li Sûdanê di nav aloziyeke dijwar de hat ku gelê wê ji ber şer û bihayên zêde êş ji kêmbûna xwarinê dikşînin. Lê tevî çavkaniyên kêm jî, gelê Sûdanê hewl dide ku giyanê hevkariyê û hêviyê biparêze.

**Navenda Nûçeyan**

Îsal gelê Sûdanê meha Remezanê di nav şert û mercên mirovî û jiyanî yên dijwar de pêşwazî kir. Meha pîroz a ji bo pîrozkirina adet, rê û resmên taybet veguheriye serdemeke ji êşê di nav pirsgirêkên aborî yên zehmet û aloziyên berdewam de ku welatî neçar dimîne di şert û mercên bêhempa yên dijwar de, di navbera bihayên xwarinê, qûtbûna elektrîkê û avê de bijîn.

### Rê û resmên Sûdanê ji ber şer hatin windakirin

Gelê Sûdanê meha Remezanê bi rê û resmên kevneşopî û adetên gelêrî ku ji paqijkirina malê, kirîna lalîkên nû yên taybet ji bo Îftar û paşîvê, hilanîna xurman, çêkirina şêraniya bi navê "El-Ebrî" ku wekî vexwarina herî bi nav û deng li Sûdanê tê nasîn, amadekirina xwarinên hişkkirî û hurkirina genim ji bo çêkirina şorbeyê ku di sifreyên Remezanê de tiştek bingehîn e; pêşwazî dikirin. Di heman demî de, gelê Sûdanê berî rûdana şer li mizgeft, meydan û qadên giştî îftarên hevbeş (xwarinên rojiyê) li dar dixistin. Ev sala sêyemîn e atmosfera cejn û şahiyê li Sûdanê li pey xwe dihêle ku ji ber şer, dûrketina ji warên xwe, penaberbûn û koçberiya bi darê zorê di nava kampên belengaziyê ku tê de birçîbûn, xizanî û nexweşî belav dibe; winda bû.

Zindîkirin û pîrozkirina meha Remezanê bûye xewnek ku gelê Sûdanê ji dûr ve dixwazin bigihêjin wê. Sifreyên Remezanê êdî bi heman baldarî nayên amadekirin, ji ber xirabûna rewşa darayî û kêmbûna mûçeyan di encama kêmbûna nirxa diravê Sûdanî de. Di Beşdarbûna civînên komî de, êdî ji ferdên heman malbatê wêdetir naçe.

### Remezana di bin giraniya koçberî û birçîbûnê de

Îsal Remezan bi giraniya bandorên şerekî ku di naveresta Nîsana 2023'an destpê kir, li ser Xertûmê hat. Bi milyonan kes naçar man ku ji malên xwe birevin û li welatên cîran penaber bibin. Piştî zêdetirî 33 mehan ji koçberiyê, hin welatî vegeriyan paytextê, lê vegera wan ne dawiya êşê bû, lê belê destpêka ceribandinek nû ya jiyanê ye.

Dîmenên rêzên dirêj li pêşiya xwaringehên xêrxwaziyê êdî ne îstîsna ne, lê wêneyekî rojane ye ya bajarekî ku ji sedî 60 zêdetir nifûs wê çavkaniya xwe ya dahatê winda kiriye.

Vîdyoyek ku ji hêla çalakvanan ve li ser medyaya civakî hatiye weşandin, jinên ku lalîkên plastîk hildigirin, zarokên ku bi cilên dayikên xwe ve girêdayî ne û mêrên ku ji rojî û fikaran westiyayî li benda xwarinek sade ji xwaringeheke xêrxwaziyê ne, xwarinek ku dibe ku têrê neke birçîbûna wan temam bike. Lê ji bo şikandina rojiya rojek din li bajarekî ku birînên wî hîn baş nebûne têrê dike. Li gorî Bernameya Xwarinê ya Cîhanî, li Sûdanê nêzîkî 21 milyon kes êşê ji birçîbûneke giran dikişînin.

### Hilweşîna aborî

Zêdetirî ji sedî 60 ji welatiyên Xertûmê çavkaniyên dahata xwe winda kirine. Kar kêm e û mûçe ji ber hilweşîna tûj a diravê herêmî kêm bûne. Ji destpêka şer ve Cinêha Sûdanê ji sedî 500 zêdetir nirxa xwe winda kiriye, nirxa dolar gihaştiye 3700 cinêha Sûdanî, berî şer ku destpêkê bike nêzî 600 cinêh bû. Di heman demê de li bazaran bihayên kelûpelan qidreta welatiyan derbas kiriye. Li bazara navendî ya Xertûmê, sebze û fêkî bi mîqdarên kêm tên firotin ji ber ku malbat êdî nikarin hemû pêdiviyên xwe bikirin. Firoşkar piştrast dikin ku veguhastin, karker û lêçûna kelûpelan bi xwe her tim zêde dibin, di heman demê de hêza kirîna mirovan kêm dibe.





### Xwaringehên xêrxwaziyê

Li herêma Hec Yûsif a rojhilatê Xertûmê, hejmara kesên hewcedar li pêşiya xwaringehên xêrxwaziyê roj bi roj zêde dibin, xwarinên ku çend meh berê têra bi sedan ji malbatan dikirin, niha bi zorê nîvê pêdiviyên wan tên peydakirin.

Ji ber kêmbûna budeceyê, ew kesên ku van înîsiyatîfan destpê dikin neçar dimînin ku xwarinê kêm bikin, da ku karibin xwarinê bidin hejmareke mezin ji kesên hewcedar. Bernameya Xwarinê ya Cîhanî hişyarî dide ku xebata wê li Sûdanê heta Hezîrana bê hewceyê 700 milyon dolarî ne û tekez dike ku nebûna fînansmana lezgîn, dê bi mîlyonan kesan ji alîkariya xwarinê ya girîng bêpar bike.

### Vegerek bê xizmet û bazarên bê rehme

Tê texmînkirin ku hejmara kesên ku vegeriyane Xertûmê gihaştiye 1,2 milyon kes, ji eslê 9 milyon kesên ku berî destpêkirina şer li paytext dijiyan. Ji sedî 70'ê zêdetir ji wan ji katagoriyên kêmdahat in, ew vegeriyan malên xwe û li taxên wan xizmetên bingehîn lê tune ne û di bazarên wan de, di nava şeş mehan de nirx bilindtir dibe.

Zehmetî ne tenê bi malbatên xizan re sînordar in, heta karmend û xwediyên karsaziyan jî ji xirabûna rewşa jiyanî astengiyan dikşînin, ji ber bacên zêde ku li ser wan tê ferz kirin ku li hember destpêkirina kar û xebatên wan digrin.

### Birçîbûn ne tenê li paytextê sînordar e

Şer li Sûdanê berdewam dike ku beşên mezin ji welat hatine wêrankirin. Li wîlayeta başûrê Kendevan, Dabeşkirina Qonaxa Ewlekariya Xwarinê ya Yekgirtî li Kaduglî paytexta wîlayetê birçîbûn ragihand û hişyarî hat dayîn ku li Dilingê jî rewşên wiha dibe ku derkeve holê. Di heman demê de li Faşirê paytexta wîlayeta Darfûra Bakur jî birçîbûn hat ragihandin. Ev yek di demekê de tê ku li gorî daneyên Neteweyên Yekbûyî, zêdetirî 21 milyon kes an jî nîvê nifûsa Sûdanê, bi astên bilind ên bêewlehiya xwarinê ya tûj re rû bi rû ne.

### Tevî hemû tiştî, îftarên hevbeş li kolanên Sûdanê vegeriya ye

Li Xertûmê, şikandina rojiyê êdî ne tenê rê û resmek rojane ye, lê kêliyek e ku têkoşîna rojekê li dijî birçîbûn û bêkarî vedihewîne. Tevî her tiştî, hin îftarên civakî ji destpêka şer ve îsal cara yekem vegeriyane kolanên paytextê. Sifreyên sade, lê dîsa jî peyama berxwedanê hildigirin.

Rêzên li pêşiya xwaringehên xêrxwaziyê berdewam dikin, li bendê dimînin û hêvî berdewam dike, her çend tenê ji bo xwarinek ku berî nimêja mexribê bi lez tê belavkirin be jî. Remezan li Sûdanê îro ne wekî berê ye, lê ew hîn jî cihek ji bo sebir, hevgirtinê û xwegirtina bi jiyanê re di nav kavilan de ye.

Di heman demê de jî şer û pevçûn di navbera artêşa Sûdanî û Hêzên Piştgriya Lezgîn li hemû aliyên Sûdanê berdewam dike, di encama vî şerî de aloziyeke mirovî ya "bê sînor" derket holê, wekî ku Neteweyên Yekbûyî bi nav kiriye.

Şerê berdewam ê di navbera artêşê û Hêzên Piştgiriya Lezgîn de ji Nîsana 2023'an vir ve Sûdanê parçe parçe kiriye. Di encamê de bi 10 hezaran kes mirin, bi milyonan kes koçber bûn, bajar û binesazî hilweşiyan. Li gelek deveran, birçîbûn hatiye ragihandin. Xertûm herwiha bajarên Um Dirman û Behrî jî di nav de, du salan navenda şer bûn, lê ji dema ku artêşê di Adara borî de kontrol kir, aramî vegeriyaye û di nav wêraniya şer de deriyê vegera hêdî hêdî bo jiyanê hat vekirin.

Hêjayî gotinê ye ku şerê li Sûdanê bûye sedema xirabûneke mezin di rewşa aborî de ku berê bi xwe jî hilwişyayî bû û rêjeyên pir mezin ji sedî 100 derbas bûne.

# Pergala (Bêpergalî) nû ya cîhanê çarenûsa Îranê!

Volqan Elî

Gelo Trump û hêzên Rojavayî ji Îranê çi dixwazin?

Di serî de rastiyeke wisa heye; şerfiroşiya hêzên Rojavayî yên hegemon ne ji ber wê ye ku biçin gelên Îranî ji bin destê rejîma zordar a Hamaney xelas bikin. Ta roja destpêkê ve taktîka hêzên hakim ên cîhanê ew e ku bi qasî karibe bi van dîktatorên Rojhilata navîn komkujî û qetlîaman bide kirin. ji Saddam bigre û herî dawî jî heta bi Beşar Esad wisa bû. Niha jî rejîma kujêr a Îranê di rêzê de ye…

Bi rastî heta bi 1990'î bizmarê cîhana me ya dihate zanîn wekî xwe saxlem bû: jixwe ew rewş-konjoktur jî bi şerê cîhanê yê duyemîn (di rastiya xwe de 'şerê parvekirina cîhanê yê di navbera emperyalîstan de') hatibû bidestxistin. Bi kurtî di encama vî şerî de cîhana wê demê bûbû du blok-cemser; ya yekê welatên sosyalîst ku hêza pêşeng Yekîtiya Sowyetan bû û ya duyemîn jî dewletên kapîtalîst ku pêşengiya wan DYE'ê dikir.

Ev rewş heta bi salên 1990'î hin caran bi rabûn û hin caran jî bi ketinê, baş yan jî xirab berdewam kir. Ev nayê maneya ku şer û alozî tinebûn, berewajî, pir şerên rizgariya neteweyî hatin meşandin û heta bi astekê şoreş hefeda têkoşeran bû, pêk hatin.

Di tevahiya vê serdemê de (1945-1990) nakokiyên heyî bi şerên şoreşgerî yan jî bi şerên dij-şoreşê dihatin çareserkirin. Şerên şoreşgerî ji aliyê gelan ve yan jî çîn û tebeqayên bindest ve dihatin meşandin. Hêz û rêxistinên bi vî karî radibûn xwe dispartin welatên sosyalîst. Ya din jî dewletên kapîtalîst di hemû şer û nakokiyan de bi piranî xwe dispartin DYE û bloka kapîtalîst. Ti hêz, rêxistin û dewlet ne bi serê xwe bûn. Ji van aliyan yek ji xwe re esas digirtin; wisa jiyana xwe didomandin.

Lê bi têkçûna Yekîtiya Sowyetan û bloka sosyalîst re, eger gotin di cih de be pergala cîhanê ji binî de şahitî. Çima? Lewra ji beriya vê, wekî dibêjin cîhan li ser du stûnan bû. Dema yek nema, pergala cîhanê tevahî têkçû.

Piştî vê dîrokê, bi taybetî jî bi Şerê Kendavê yê Destpêkê re (1991), hêzên hakim ên cîhanê bi pêşengiya DYE'ê hewl dan ku pergala cîhanê li gorî berjewendiyên xwe rêkûpêk bikin. Ji beriya vê, li Helebce û gelek cihên Başûrê Kurdistanê tevkujî û jenosîd ji aliyê Saddam ve li serê Kurdan hate meşandin. Hêzên hakim ên cîhanê pêşî lê vekirin ku Saddam van kiryaran pêk bîne. Li ser vê bingehê xwe rewa kirin ku destwerdana li Saddam bikin. Rejîma wê serdemê ya Saddam ne tenê li serê Kurdan, bi Erebên Şîa û hemû muxalifên xwe hema tiştî kir.

Bêguman Îraq ji vê re mînakek e. Lê ne bi tena serê xwe ye. Mînaka herî balkêş û sosret teqandinên Bircên Cewî yên li DYE'ê bû. Tê zanîn di Îlona 2001'ê de rêxistina bi navê El-Qeîdeyê li DYE'ê di rêzeçalakiyên li dar xistiye zêdetirî pênc hezar mirov mir. Jixwe ji ber van encaman, ev bûyer têra xwe bi xof e. lê ecêba vê bûyerê ne ku El-Qeîdeyê ev tevkujî kiriye yan tiştekî din! Tiştê ecêb ew e; niha ji aliyê dewlet û hêzên navborî ve wekî li xwe mukur werin dibêjin 'El-Qeîde yan jî nizanim kîjan zilamê wê yê mezin me perwerde kiriye û me hewandiye'. Dîsa tê zanîn ku nizanim çend hezar cihûyên li wan Bircên Cewî wezîfedar, wê rojê naçin li ser kar. Em nabêjin ew bûyer DYE û Cihûyan daye kirin; na! Ev gotin ne îdîa yan jî fikrên me ne; agahiyên ji ber destê rêxistinên wan ên îstixbaratê ve bi zanebûn hatine belavkirin. Jixwe ev jî bi dehan sal e ku ji aliyê her kesî ve têne zanîn; nemaye ku werin jibîrkirin.

Hêzen hakim ên cîhanê û bi taybetî jî DYE ev rêzeçalakî kirin sedem û herî dawî bi giranî 2010 li ser Rojhilata Navîn destwerdana xwe dane destpêkirin. Bi Tunusê dest pê kirin û di Sûriyê re derketin. Misir, Libya li gorî xwe dizayn kirin. Dema em vê dibêjin, li wan welatan dînamîka têkoşîna gelan tine nayê hesibandin. Berewajî, gelên herêmê hêza esasî ku li van welatan li dijî dîktatoran ketibû tevgerê bûn. Îro jî heman tufan li ser serê Îran e tê meşandin. Derd û kula Trump û hêzên hakim ên cîhanê ne ew e ku rejîma xwînmêj a meleyên Îranê hilweşîne; derdê wan ew e astengên li Îranê ku li ser riya wan a bazirganiyê dibin kelem ji holê rakin. Eger ev kes Elî Hamaney jî be, dilê Trump pê naşewite! Ji ber ku her deqaya derbas dibe ji berîka Trump kêm dike. Sibe, du sibe dibe ku Erdoğan jî li ber çavê Trump bibe reş! Çima nebe? Dagirkeriya Tirk pir pesna xwe dide ku welatê wan pir jeostratejîk e; bira wisa ye! Eger vê rastiyê du sibe, Trump jî bibihîze…

# Rola Diasporaya Kurdî û Qedera Rojava

Ehmed Goyî

Di nav tarîtiya şerê navxweyî yê Suriye de, di nav kaosa siyasî û jeopolîtîk a herêmê de, Rojava ne tenê wek herêmekê xweparastinê derket holê; ew wek bi hişmendîyek Netewî, wek rêxstinek mafparêz û wekhevî, wek gotinek nû ya li ser demokrasî, wek daxwazek xwerêveberiya gelan jî xwe nîşan da. Di nav şert û mercên herî dijwar de, modeleke rêveberiya herêmî, ku li ser bingehên hevjiyana gelan, azadiya jinan û rêveberiya komînal hat avakirin, bi navê Rojava di dîrokê de cih girt.

Lê statû ne tenê bi çeperên şer de tê parastin; statû bi hişmendî, bi aborî û bi dîplomasî jî tê xurtkirin. Li vir rola diasporaya Kurdî derdikeve pêş.

### Diaspora wek Hêza Nerme

Kurdên ku li Ewropa, DYA, Kanada û welatên din ên li Diasporeyê dijîn, di nav pergalên demokratîk de xwedî maf û amûrên qanûnî ne. Ev maf û amûr, eger bi stratejiyeke dirêj û sazûmanî werin bikaranîn, dikarin veguherin hêzeke dîplomatîk a girîng. Lobîkirin ne tenê nivîsandina nameyan e; ew avakirina têkiliyên domdar, çêkirina torên siyasî, û gihîştina ajandaya parlementeran e. Rojava divê ne wek mijareke şerê herêmî, lê wek modelek mafnas wekhevîya gelan û demokrasiyê were şîrove kirin.

Diaspora dikare gotûbêja mafên mirovan, parastina azadiya jinan û hevjiyana etnîk bikevin nav gotûbêjên siyasî ya welatên xwe. Heger Rojava di zimanê siyaseta navneteweyî de veguherê ji "krîzek herêmî" ji bo "çarenûsek civakî", ev guherîn bi destê diasporayê wê pêk vere.

### Aborî: Bingehê Statûyê

Statûya siyasî bê bingeha aborî nabe, Di şert û mercên ambargoyên dewletên cîran, û astengiyên bazirganiyê de, Rojava hewceyê sermayeyê, zanistê û tecrûbeya teknîkî ye.

Diaspora dikare Fonên şeffaf û kontrolkirî ava bike ku veberhênan bi awayekî sazûmanî rêve bibe, Di warê enerjiyên nûjen, çandiniya modern û teknolojiyên dîjîtal de xebat bike. Kooperatîfên herêmî bi bazarên Ewropayê re girê bide. Serxwebûna aborî, parastina biryara siyasî ye. Welatek ku xwe bixwe bîne ser xwe, di masa gotûbêjên navneteweyî de jî xwedî giraniyekî din dibe.

### Zanist û Çand: Şerê Li Ser Vegotinê

Şerê li ser kurdên Rojava ne tenê êrîşa çete û hêzên çekdar ên girêdayî Tirkiye ne, her wiha li nav qada Navnetewî siyaseta reşkirinê jî dimeşînin, li ser vegotinê, li ser wêneyê jî tê kirin. Gelek caran Rojava bi çavê ewlehiyê an bi çarçoveya leşkerî tê şîrove kirin. lê Rojava her wiha realiteyek e, Welatê Kurdan e li vî welatî milyonan kurd niştecihin, Kurd modelek ya Demoqrasîya herêmê ye.

Akademîsyen û nivîskarên diasporayê dikarin: Lêkolînên zanistî li ser modeleke rêveberiya herêmî bikin,

Ziman, dîrok û civaknasiya Kurdî bixin nav lîteratûra navneteweyî, Konferans, panel û platformên zanistî rêxistin bikin.

Heke Rojava di nav zanistê de were nas kirin, ew meşrûiyeta xwe di asta cîhanî de xurtir dike.

### Medya û Hişmendiya Raya Giştî

Di demekê de ku medyaya civakî dikare ajandayên cîhanî biguherîne, diaspora xwedî derfetan mezin e. Belgesazî, kampanyayên hişmendiyê — hemû dikarin wêneyê Rojava veguherînin.

Belgekirina binpêkirinên mafên mirovan û gihandina wan bo platformên navneteweyî, dikare zexta dîplomatîk zêde bike. Heger raya giştî di welatên demokratîk de were agahdar kirin, siyaseta fermî jî di dawiyê de bi bandor be, dê balê bikişîne ser Rojava.

Yekîtî: Şerta Serkeftinê

Diaspora, tevî cûdahiyên siyasî û fikrî, hewceyê platformeke hevbeş e. Armanc divê zelal bin:
Naskirina statûya qanûnî ya Rojava
Rakirina ambargoyên aborî
Parastina ewlehî û sivîlan

Stratejiyeke neteweyî ya domdar, li şûna reaksiyonên hestyarî yên demkurt, dikare encamên dirêj demê biafirîne.

### Encama Dîrokî

Qedera Rojava bi şehîdan hat nivîsandin, lê bi zanist, aborî û dîplomasî dê were parastin. Diaspora ne tenê şaxekî dûre welatê xwe ne ; ew beşekî bingehîn ê hêza neteweyî ye.

### Pirsa girîng ev e

Ma em ê tenê bi hest û hîskirina hestyarî bimînin, û ne xwe bi xwepêşandinekê tetmîn bikin! an jî bi stratejiyeke rêxistî û domdar pêşeroja xwe ava bikin?

Heke hişmendiya neteweyî birêxistin bibe,

Hebûna miletê Kurd ne tenê bi xwîn, lê bi aqil û stratejî jî dê bê parastin. Û di vê pêvajoyê de, rola diasporayê ne kêmtir ji rola navxweyî ye belkî di gelek waran de girîngtir e.



# Gefên li Iraqê û amadekariyên leşkerî yên li derdora Şengalê

**Piştî şerê Rojavayê Kurdistanê xuyaye dixwazin berê xwe bidin Iraqê û bi taybet gelê Kurd, Hakan Fîdan got: "Piştî Sûriyê dora Iraqê tê". Di van demên dawiyê de zelal e ku dixwazin fermaneke nû li ser Civaka Êzidî li Şengalê rakin ku hikumeta Iraqê derdora Şengalê amadekariyên xwe yên leşkerî dike.**

Esma Miştefa

Piştî êrişa DAIŞ'ê li ser bajarê Mûsilê di 10'ê Hezîrana 2014'an de, DAIŞ'ê di 3'yê Tebaxa 2014'an de dest bi êrişa li ser bajarê Şengalê kirin. Şengal ne ku cara yekê ye rastî êrişa nijadperestiyê tê ku di dîroka xwe de civaka Êzidî di hewildanîn qirkirin û fermanan de, nas kirî ye. Dema di sala 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê êrişî Şengalê kirin ne hikumeta Iraqê ne jî PDK'ê karî Şengalê biparêze. Li hember êrişên ku li ser Şengalê hatine kirin, hemû gelê Îraqê, PDK'ê û partiyên din yên Kurdistanê tu destwerdaneke leşkerî nekirin. Di rûbirûna Civaka Êzidî bi qirkirinê re; civaka navnetewî û navxweyî bê deng ma.

Tevgera Azadiya Kurdistan, YPG'ê, YPJ'ê û YPŞ'ê Şengal ji fermanê xilas kirin. Ev yek tu kes û tu hêz nikarin înkar bikin ku di wir de tenê van hêzan karî DAIŞ têk bibira, û di encama ewqas windahî, kuştin û revandinan de, Şengal neket destê DAIŞ'ê û Rêveberiya xwe ya xweser avakirin.

Me zanî ku Şengal û Civaka Êzdî ji ber ol û baweriya xwe ji aliyê DAIŞ ya ku bi zihniyeta xwe tu ol û bawerî derveyî Îslama tund qebul nake. Dîroka wan ya ku bi hezaran ji jin û zarokên Êzidî girtine û li Reqayê firotine wê neyê jibîrkirin. Ji bo DAIŞ civaka Êzdî bi her awayî qirkirina wan ferz e û divê tune bibin. Heyanî niha ji kiryarên ku li ser civaka Êzdî hatine kirin îsbat bûne, ne nîvê rastiya ku hatiye jiyankirine. Heyanî niha ji Gorên Komî yên Êzdiyan tê keşifkirin, jinên ku hatine kirîn û firotin hê neghêştine malbatên xwe û bi dehan bûyerên bi êş hene.

Piştî şerê Rojavayê Kurdistanê xuyaya ku hêzên navneteweyê û navxweyî berê xwe bidin Îraqê û DAIŞ di wir de nû nû vejîn bikin. Ev yek jî di gefên ji bo Kerkuk, Mexmûr û Şengalê hatin kirin de tê xuyakirin.

### Daxwazên gurbûna Tirkiyê ji bo şerê li dijî Şengalê

Bi taybet di van geşedanan de em rola Tirkiyê ya çalak di her derê de dibînin, rase rast Tirkiyê bûye wele mînaka 'tu kîjan kevirî li Sûriyê û Îraqê rake tuyê di bin de bibînî' wisa lê hatiye ku ji bo van alozî, kirîz û tevlîheviyan ji sînorên xwe dur bixîne, destwerdana xwe li her derê kiriye.

Bi taybet di mijara gelê Kurd de Tiriyê dijminê yekemîne, mijara Şengalê jî ji vê yekê ne dure ku dixwaze van êrişan li ser Şengalê gur bike ji ber ku Kurd in û Êzidî ne.

Di nivîseke Ajansa Rojnewsê de girêdayê rola Îraqê li ser van geşedanan wiha hatibû ser ziman. Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Hakan Fîdan di hefteya borî de rast rast perde li ser pilaneke tirsnak ya li dijî Şengalê rakir. Hakan Fîdan got: "Piştî Sûriye dora Iraqê tê. Divê Hikumeta Iraqê sûdê ji ezmûnên Sûriye werbigirie. Desthilata xwe li ser temamê xaka xwe ferz bike. Iraqê biparêze. Piştî Sûriye niha dora Iraqê ye û em diçîn wir jî."






Ya balkêş piştî van gefên Hakan Fîdan ji rayedarên Iraqê gelek nerazîbûn hatin, lê ev nerazîbûn weke tê dîtin ne bi niyetek baş tê kirin. Ji ber di rojên dawî de Artêşa Iraqê li Şengalê bi rê û rêbazên cûda ketiye nava hewldanên xeternak.

Wezareta Karên Derve ya Iraqê piştî gefa Hakan Fîdan, balyozê Tirkiyê yê li Bexdayê Anil Bora Înan vexwendibû wezaretê û hate gotin; "Meseleya Şengal û hemû deverên din ên Iraqê meseleyeke neteweyî ye û em hemû destwerdana biyanî red dikin."

Lê tevî ji Iraqê gelek nerazîbûn hatin, di hefteya borî de Wezîrê Parastinê yê Iraqê Sabat Ebasî û Wezîrê Derve yê Tirkiyeyê Hakan Fîdan li Enqereyê civiyan. Di civînê de çi hat nîqaşkirin, nehate zanîn, lê tê gotin rojeva sereke Şengal bû.

Piştî Wezîrê Parastinê yê Iraqê ji Enqereyê vegeriya, Artêşa Iraqê li Şengalê kete nava liv û tevgerê. Di rojên dawî de li Şengalê liv û tevgerek leşkerî tê dîtin, Artêşa Iraqê bi rê û rêbazên cûda hêdî hêdî hewl dide dest dane ser Şengalê û Rêveberiya Xweser ya liwir tine bike. Herwiha dixwaze bê parastin bihêle.

### Iraq gefên Hakan Fîdan dixe meriyetê

Di demek ku gefên DAIŞ'ê û komên çete li ser Êzidiyên Şengalê zêde bûye de artêşa Iraqê li Şengalê dest bi bêçekkirina welatiyên Êzidî kiriye ku ji bo parastina xwe hildigirin. Hate zanîn ku li seranserê Şengalê leşkerên Iraqê dest bi komkirina çekên welatiyan kir ku ji bo parastina xwe li gel xwe radikin.

### Iraq cihên nû çêdike

Tê gotin Artêşa Iraqê bê ku hemahengiya li gel Asayîşa Êzidxanê bi kepçe û dozeran berê xwe daye seytereya Şehîd Gênco ya hevbeş a Polîsên Federal û Asayîşa Êzidxanê, da ku noqteyeke leşkerî ya nû ava bike. Seytereya Şehîd Gênco ya ser bi Asayîşa Êzidxanê ji 2017'an ve hatiye danîn û ev demeke dirêje bi awayeke hevbeş ji aliyê Asayîşa Êzidxanê û Polîsên Federal ve tê rêvebirin ku heya niha ti pirsgirêk jî rûnedane.

### kiryarên dawî metirstiya pêkanîna êrişan zêde dike

Bi van kiryarên dawî, derdikeve holê ku li ser Şengalê niha xeteriyek mezin heye. Li gorî gefên Hakan Fîdan û liv û tevgera Artêşa Iraqê ya li Şengalê, dewleta Tirk li ser Şengalê bi Iraqê re lihevkiriye. Tevî Iraqê nerazîbûn nîşan dide jî, lê ev yek êdî bi zelalî tê dîtin ku wê dewleta Tirk bi destê Iraqê destwerdanek li Şengalê bike.

Niha Şengal dibin metirsiyek cidî deye, lewma di demek ku Amerîka xwe amade dike li Îranê bide, dibe ku di wan deman de dewleta Tirk jî destwerdanê li Şengalê bike. Lewma niha pêwîstiya Şengalê bi piştgiriyek mezin heye. Lê tevî metirsiyan jî, heya niha deng ji Hikumeta Herêma Kurdistanê û rayedarên Herêmê derneketiye. Ev jî gelek balkêşe, lewma pirsa gelo senaryoya di sala 2014'an de carek din dubare dibe, dikeve serê her kesî.

# Zubeyde Zumrut: Divê zagonên pêvajoyê werin çêkirin

Hevseroka KCDK-E Zubeyde Zumrut diyar kir ku eger dewleta Tirkiyê dixwaze bi Kurdan û hemû gelên din re bi aştî jiyan bike, yek ji pîvanên bingehîn ew e ku şert û mercên demokratîk qebûl bike û got, "Komîsyona ku li ser vê bingehê hatiye avakirin, dive di çarçoveya zagonî de guhertinên demokratîk pêkbîne."

**Ronaz Silêman**

Derbarê hevdîtina 16'ê Sibatê ya bi Rêber Apo re, entegrasyona demokratîk û xebatên komîsyonê, hevseroka KCDK-E'yê Zubeyde Zumrut bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Di 27'ê Sibatê de sala yekemîn a bangewaziya Aştî û Civaka Demokratîk pêk hat. Rêber Apo di hevdîtina xwe ya 16'ê Sibatê de got ku qonaxa yekemîn qediya û niha derbasî qonaxa duyemîn dibin, hûn vê çawa dibînin?**

Di 27'ê Sibata sala bûrî de Rêber Apo bangeke dîrokî kir. Beriya wê jî di Meclisa Tirkiyê de ji aliyê Devlet Behçelî ve daxuyaniyek hate kirin ku pirsgirêka Kurd heye û divê di bin sîwana meclisê de, li ser bingehek siyasî û hiqûqî bê çareserkirin. Li ser vê bangewaziyê, Rêber Apo ji Girava Îmraliyê her çendî di şertên tecrîdeke giran de bû, bersiv da û ragihand ku ew her dem ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd amade ye, lê şertê ku zemînekî demokratîk hebe. Di heman demê de Rêber Apo ev yek jî tekez kir ku her dem bangewaziyên wî li ser wê bingehê bûn û ew niha jî amade ye, hem di asta teorîk û hem jî di asta pratîkê de ku ew vê mijarê di çarçoveya zagonan û di zemîneke siyasî de çareser bike. Herwiha Rêber Apo diyar kir ku divê çareserî di bin sîwana Meclîsa Komara Tirkiyê de pêk were. Di daxuyaniya 27'ê Sibatê de Rêber Apo hin pîvan danîn holê ku li ser kîjan rê û rêbazê pirsgirêka Kurd bê çareserkirin. Wekî guhertina zagonên Tirkiyê, naskirina çand û nasnameya gelê Kurd, naskirina zimanê Kurdî di asta fermî de û avakirina zemînekî demokratîk ji bo jiyaneke hevpar. Lê dewleta Tirk vê mijarê wekî teror digire dest, lê mijar wisa nîne. Ne em û ne jî Rêber Apo bi wî awayî nêz dibin û vê yekê qebûl nakin.

Lê belê piştî 27'ê Sibatê gekek gav ji aliyê Rêber Apo û tevgera azadiya de hatin avêtin. Tiştê Rêber Apo da pêşiya xwe, gav bi gav bi cih anî, mîna agirbest hate ragihandin û hin gavên sembolîk hatin avêtin. Lê heta niha, ji aliyê dewletê ve gavên pratîk û guhertinên hiqûqî yên ber bi çareseriyê ku bibe bersiv ji bangê re, nehatiye avêtin. Çend hevdîtinên ku ji aliyê malbat û heyetê bi Rêber Apo re tên kirin, nayê wateya bangewaziya ku Devlet Bahçelî kiribû, hatiye bicîhkirin. Ji ber Bahçelî gotibû: "Bila Rêber Apo were di meclisê de pirsgirêka Kurd çareser bike û bangewaziyê rêxistina xwe bike, da ku siyaset û têkoşîneke demokratîk bikin. Elbet, gelê Kurd zêdeyî 40 salan siyaset û têkoşînek demokratîk daye meşandin. Ji ber ku nav û nasnameya wî tune bû, ji bo parastina nasnameya xwe û ji bo ku nasnameya wî di asta statûyê de bê qebûlkirin û statûya xwe bidest bixe, têkoşîn kir û berdelên giran da. Lê dewleta Tirk, Bahçelî, AKP û MHP di asta bangewaziyê de mane ku tenê komîsyonek hatiye avakirin. Her çiqasî avakirin komîsyonekê li meclisê girîng e, lê hewceye qanûnên ku li hemberî siyaseta demokratîk bi tundî tê bikaranîn, werin guhertin.

**Rola komîsyonê û pêdiviya guhertina qanûnên Tirkiyê çi ne?**

Avakirina komîsyon bêguman rola wê girînge. Ji ber ku pêdivî ye hinek tişt bên guhertin. Hê qanûnên Tirkiyê li hemberî siyaseta me û têkoşîna me pir tund in. Li hemberî polîtîkaye me jî ev tundî berdewam dike. Ji ber vê yekê kesên siyasetmedar nikarîbûn siyasetekî demokratîk bi meşînin. Yên wisa jî dikirin, bi cezayên giran dihatin cezakirin, niha jî girtîgehên Tirkiyê bi wan hatine tijîkirin. Çima ev yek jî pêk dihat? Ji ber ku zemînekî siyasetekî demokratîk li Tirkiyê tune bû. Me jî parastina siyasetekî demokratîk, têkoşînekî demokratîk û jiyanekî hevpar dikir. Lê belê, qanûnên Tirkiyê li hemberî siyasetekî demokratîk pir tund bûn û divê ev werin guhertin. Heke dewlet û hikumeta Tirkiyê îro dixwaze ku Kurd û hemû gelên din bi giştî karibin bi hev re jiyan bikin, lazim e van qanûnan biguherîne. Ev komîsyon jî ji bo pêşxistina vê armancê divê hin kar û xebat bidin meşandin. Ev kar û xebat tenê guhertina qanûnan nîne, mijar girîng ew e ku em ê çawa bi hev re jiyan bikin û di kîjan astê de vê jiyanê ava bikin. Rêber Apo bang kir, PKK'ê fesih bû û bi awayekî sembolîk çek hatin dayîn. Ji aliyê siyasetekî demokratîk ve şer rawestandin û agirbest hat ragihandin. Ev hemû jî bersiva Rêber Apo ya 27'ê Sibatê bû. Em amade ne ku vê pêvajoyê bi têkoşînekî demokratîk bidomînin û di vê çarçoveyê de xebat bikin.

**Rêber Apo bi destpêkirina pêvajoyê re jî bal dikşand ser entegrasyona demokratîk, lê di hevdîtina vê dawiyê de jî careke din behsa pîvanê bingehîn yên entegresyonê dike, ev pîvan çi ne û hûn van pîvanan çawa dinirxînin.?**

Rêber Apo bi destpêkirina pêvajoyê re bal kişand ser mijara entegrasyona demokratîk û vê yekê di her hevdîtinê de dubare dike. Di hevdîtina dawiyê de jî careke din pîvanên bingehîn ên entegrasyonê anî ziman û girîngiya wan di asta teorî û pratîkê de diyar kir. Entegrasyon tenê têkiliyek civakî an siyasî nîne, lê pêvajoyek e ku divê li ser bingehek demokratîk were avakirin. Li gorî Rêber Apo ji bo entegrasyonekî demokratîk pêk bê, divê di serî de, zemînekî demokratîk were damezrandin. Heta ku ev zemîn neyê çêkirin, ne pêvajoyekî rastîn a entegrasyonê dikare dest pê bike û ne jî dikare li ser wê were axaftin. Ji ber vê yekê, yek ji pîvanên bingehîn ew e ku şert û mercên demokratîk bên qebûlkirin û di çarçoveya zagonî de guhertinên pêwîst werin kirin. Ji ber zagonên heyî yên dewletê ji bo jiyaneke hevpar û entegrasyonekî demokratîk nabe bersiv. Heya ku zagon ne li gorî bingehên demokrasiyê neyên nûkirin, ne pêvajoya entegrasyonê dikare bi awayekî rastîn pêşve biçe. Ji ber vê yekê, guhertina zagonan û damezrandina zemînekî zagonî yê demokratîk wek şertê bingehîn tê dîtin. Komîsyona ku ji bo vê armancê hat avakirin jî raporek amade kir û ew rapor bi çapemeniyê re hat parvekirin. Lê ev rapor hê jî bersiva bendewarî û daxwazên civakê nade. Ji ber vê yekê pêvajoya entegrasyona demokratîk hewceyê gavên rastîne

**Komîsyona ku hatiye avakirin heta asteke xebat da meşandin û rapor pêşkeş kir, Rêber Apo ji bo raporê dide diyarkirin ku lazime rapor li gorî hêviyên civakê be. Hûn vî rapora ku hatiye amadekirin çawa dibînin?**

Hêviyên gel ji vê pêvajoyê hene. Yek ji wan jî ev e ku salek di ser bangewaziyê re derbas dibe. Di nava salekê de, bi bangewaziya Rêber Apo heta îro gelek kar û xebat hatine kirin û amedekariyên vê raporê hatine amadekirin. Lê belê naveroka raporê ne li gorî giraniya pêvajoyê bû, herwiha ne li gorî bendewariyên gel jî bû. Lewra divê rapor bersivekê li gorî asta vê pêvajoyê bide. Li ser vê yekê hem rexne hene, hem jî pêdivî ye ku naveroka raporê li gor entegrasyonekî demokratîk, jiyanekî hevpar û jiyanek ku civak karibe bi hev re jiyan bike were amadekirin. Ser wî esasî, divê zagonên vê pêvajoyê werin çêkirin.

Di serî de divê bê gotin ku muzakere di navbera dewletê û Rêber Apo de tê meşandin û ev pêvajoyek muzakereya çareseriyê ye. Lê sîstema tecrîdê ya Îmraliyê hîn jî berdewam e û şertên bingehîn ên pêşveçûna pêvajoyê hîn nehatiye avakirin. Ji bo ku muzakere bi awayekî cidî û bi encam pêş bikeve, pêwîst e ku di destpêkê de zemîn û bingehên siyasî û qanûnî bêne danîn. Li gor bangewaziya dewleta Tirk û bi taybetî daxuyaniyên Devlet Bahçelî, şertên azadiya fîzîkî ya Rêber Apo hîn nehatiye pêkanîn. Heta ku ev şert neyên amadekirin, çiqas hevdîtin bêne kirin û heyet serdana rêbertî jî bikin, muzakereya rastîn û dualî nikare pêş bikeve. Çareserî tenê dema ku her du alî li ser yek zemînê bi hev re kar bikin û şertên wekhev ji bo muzakereyê hebin, dikare pêk were. Heke şertên wekhev neyên pêkanîn, pêvajoya muzakereyê nikare bi rehetî û serkeftin pêş bikeve. Hêviyên gelê Kurd û gelên din ên her çar parçên Kurdistanê di vê çarçoveyê de zelal in. Gel hêvîdar e ku bangewaziya ji bo siyasetekî demokratîk ku hatiye kirin, bi lez û bi cidiyet li ser esasên wê bê bicihanîn. Di naveroka raporan û nirxandinên niha de, divê hem giraniya dîrokî ya vê pêvajoyê û hem jî bandora wê ya stratejîk were xuyakirin. Ev pêvajo tenê mijarek rojane nîne, lê qonaxek dîrokî ye ku dikare rê li ber çareseriyek bingehîn veke. Girêdayî têkoşîn, kar û xebatên siyasî divê bi awayekî berfireh û rêkûpêk bêne meşandin. Di nava vê yekê de her kes dikare rola xwe bilîze, bi taybet gelê Kurd li her çar parçên Kurdistanê tevî gelên ku îro dixwazin rola xwe di mijara çareserkirin pirsgirêka Kurd de, bilîzin, divê têkoşîna xwe hîn xurtir bikin.



# 'Êrişên dijî Rojava rê li pêşiya Şevçirayên Rojava girt'

Cîgirê serokê HRRK'ê Mistefa Ebdo da zanîn ku rewşa ewlehî û êrişên dijî Rojava bûn sedem ku çalakiya Şevçirayên Rojava neyê lidarxistin û got, "Şevçirayên Rojava çalakiyeke girîng e ji bo wêjeya Kurdî. HRRK'ê bi çalakiyên xwe hewl dide rêwîtiya karê netewî bidomîne."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

HRRK'ê ji bo parastin wêjeya Kurdî û pêşxistina asta rewşenbîrî li Rojava kar û xebatên bi sûd û giranbuha dimeşîne, yek ji xebatên wê yên domdar jî, çalakiyên Şevçirayên Rojava ye.

Ev çalakî di sala 2022'an de yekem car hat lidarxistin. Şevçirayên Rojava di şevên meha Remezanê de li navenda HRRK`ê ya bajarê Qamişlo dihat lidarxistin. Lê ji ber rewşa dawîn ya ku Rojava tûşê wê hat, Şevçirayên Rojava nehat lidarxistin. Derbarê heman mijarê cîgirê serokê HRRK'ê Mistefa Ebdo ji rojnameya me re axivî.

**'Şevçirayên Rojava çalakiyeke çandî ye'**

Mistefa Ebdo diyar kir ku çalakiya Şevçirayên Rojava çalakiyeke çandî û wiha axivî: "Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê, komeleyeke çandî ye, ji bo pêşxistina wêje û zimanê Kurdî xebatên mezin dide meşandin. Herwiha hewl dide ku bibe komekî rewşenbîrî ji ramanên estetîk û afrîneriya hemû rewşembîrên Rojavaê Kurdistanê re. Yek ji çalakiyên çandî yên cihêreng ku Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) ku hertim di navbera Remezanê de di navenda hevgirtinê de li dar dixist, çala-



kiya Şevçirayên Rojava bû. Ew bernameya çandî ya cûda ye ku hemû qada çandî ya Kurdî di hemî şêwazên xwe de tê de, wek çîrok, helbest, huner, semîner, civînên gotûbêjî, pêşandanên şano û sînemayê di nav xwe de dihewîne. Di heman demê de li ser mijarên ku têkildarî çanda Kurdî nîqaş dibe."

**'HRRK'ê bi çalakiyên xwe hewl dide rêwîtiya karê netewî bidomîne'**

Mistefa destnîşan kir ku HRRK bi çalakiyên xwe hewl dide rêwîtiya xebata niştîmanîn bidomîne û wiha anî ziman: "HRRK'ê bi rêya van çalakiyên çandî û neteweyî hewl da ku rêwîtiya çandî û neteweyî bidomîne. Herwiha bi riya wê çand, raman û afirîneriyê wek mîraseke mirovî, netewî û exlaqî binirxîne. Ji ber vê yekê divê çanda Kurdî bê piştgirîkirin û hêmanên çandî û manewî yên taybet ên çanda Kurdî di çarçoveya navxweyî û Kurdistanê de bên nîşandan, divê ev bibin rêgez di hundirê navenda me de û hem jî ya derveyî navenda yekîtiyê de, di van çalakiyan de bên bikaranîn. Lidarxistina van çalakiyan dibe sedem ku zanîna teorîk a rewşenbîran veguherîne berhemeke çandî ku hişmendiyê zêde bike û bandoreke erênî ya berbiçav ava bike. Di vê qonaxa hestyar de, berpirsyariya exlaqî ya ku dikeve ser milê rewşenbîrên Kurd, pêwîst dike ku ew bi gel û civaka xwe re bisekinin, dawî li kaos û parçebûna çandî bînin û gotinên nefretê red bikin. Ev yek tenê bi dûrketina ji takekesî û xebata di nava hundirê yekîtî, sazî an jî rêxistinekê de dikare pêkwere, li şûna wê bi xebata çalak, yekkirina helwest û dîtinan, hem jî plansaziya projeyên çandî û ramyarî ji bo bilindkirina asta çanda Kurdî heta asta bûyerên ku li herêmê diqewimin."

**'Êrişên li ser Rojava rê li pêşiya Şevçirayên Rojava girt'**

Ebdo da zanîn ku êrişên li ser Rojava û rewşa heyî bû sedem ku çalakiya Şevçirayên Rojava li dar nekeve û wiha domand: "Wekî her sal, di meha Remezana pîroz de, Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê (HRRK) diviyabû di cara xwe ya pêncemîn de bernameya xwe ya Şevçirayên Rojava bidomîne. Lê belê rewşa heyî û rewşa ewlehiyê ya Rojava û herêmê rê li ber vê salê girt ku bernameya me were lidarxistin. Dîsa jî ev yek nahêle ku em di rojên pêş de ji bo hin çalakiyan amadekariya bikin. Em bi hêvî ne ku aramî çêbibe da ku em bikaribin çalakiyên xwe yên çandî ji nû ve dest pê bikin û hawîrdoreke çandî ya layîqî rewşenbîrên Rojava, afirîneriya wan û êş û fedakariyên gelê me, afirîneriyê bidomînin."

**'Çalakiyên weke Şevçirayên Rojava ji bo wêjeya Kurdî pir girîng in'**

Mistefa Ebdo tekez kir ku çalakieyeke weke Şevçrayên Rojava ji bo nivîs û wêjeya Kurdî pir girîng e û wiha bi lêv kir: "Nivîskar, helbestvan û wêjevan vê çalakiyê ji xwe re weke derfeta pêşketinê dibînin. Herwiha ev bername asta ronakbîrî ya kesên beşdar diyar dike û wan hertim bi wêje û çanda Kurdî ve girêdide. Ji bo rewşenbîrên Kurd, rêxistinkirina çalakiyên çandî dibe alîkar ku bandor û têkilya wan bi civakê re zêde bibe. Derfet li pêş nivîskar û rewşenbîran çêdibe ku bi gel re bide û bistîne, hem jî rê dide ku tecrûbe û zanyarî bên parvekirin. Di heman demê de ew ji bo balkişandina projeyên xwe yên rewşenbîrî, hem jî ronakbîrî û ramanên xwe ji nerîneke taybet ber bi projeyên jiyana rasteqîn ve veguherîn. Wekî din, ew hawîrdorek ji bo nîqaşên cidî û danûstendina ramanan diafirîne, ev yek dihêle rewşenbîr di warê afrîneriyê de berdewam bike.

**'Berpirsyariya pêşxistina çandê berpirsyariya hevbeşa a rewşenbîran e'**

Cîgirê serokê HRRK'ê anî ziman ku berpirsiyariya pêşxistina çandê erkekî hevbeş ê rewşenbîran e û wiha bi dawî kir: "Berpirsiyariya çalakkirina rewşa çandî berpirsyariyeke hevbeş a rewşenbîran e. Ji mafê rewşenbîran e ku ji civakê guhdan û piştgiriyê bistînin da ku ew bikaribin hewildanên xwe ji bo pêşxistina xebatên xwe yên çandî terxan bikin. Rewşenbîrên Kurd di civaka me de westiyayî û kedxwarî ne û sînorên îdeolojîk, sînorên civakî û têgihiştinên civakî yên şaş rewşenbîran biçûk dixin û di nav dîwarên xeyalî de dîl digirin. Ji ber vê yekê, afirînerî girêdayî baldariya rewşenbîr û rakirina astengiyên li ser riya wan e. Di dawiyê de em wek Hevgirtina Rewşenbîrên Rojava di wê baweriyê de ne ku parastina ziman û çanda Kurdî bi taybetî di qonaxa heyî de pêwîstî bi rêxistineke stûnî ji bo hemû rewşenbîrên Kurd heye."

# Xwendineke kurt li ser destanê

**Navenda Nûçeyan**


**Destan beşeke wêjeyî ye ku dîroka wê vediger hezarê salan, ew çîrokeke dirêj ku bi awayê helbestî hatiye nivîsîn. Destan dîroka gelan vedibêje, tê de çîrokên lehengî an jî evîndariya kesên taybet dibêje.**

Destan, cûreyekî wêjeyî yê kevin e. Peyva "Dastan an Destan" peyveke Îranî ye. Di Kurdî da hem peyva destan hem jî peyva "Beyt, Qiset" tê bikaranîn. Li hemberî vê peyvê li Rojava "epos" tê bikaranîn. Epos bi bingeha xwe de Grekî ye û tê wateya çîrokên menzûm. Epos, ew serboriyên wesifdar û derasayî yên xweda, xwedawend, wekxweda û lehengan e ku bûyerên mezin ên qewimîne û di bîra civakê da bicih bûne[1]. Di destanan da bûyerên dîrokî û civakî yên karîgeriyeke mezin li ser civakê hiştî bi awayekî menzûm têne vegotin. Di jiyana netewan da gelek serhatiyên ku rengvedana wan bi borîna demê ra nehên jibirkirin hene. Ev serhatî dibe ku şerek an qehremaniya şexsekî an jî afeteke li kûrahiya civakê şopa xwe hiştî. Ev serhatî bi rêka destanê ve têne rengînkirin û dewlemendkirin. Jibo ku bi sanahîtir di bîra civakê da bête parastin bi awayê menzûm û rewanbêjî têne vegotin.

Wekî tête zanîn Destan di sê qonaxan derbaz dibin.

1. Derketina Destanê: di vê qonaxê da hinek bûyerên dîrokî û civakî diqewimin û ev bûyer di xeyal û şuûra netewê ya hevpar da teşe digire. Kesên di van bûyeran da cih girtî di xeyala civakê da cihekî girîng digirin.
2. Belavbûn: bi dewlemendkirina bûyer û lehengan ve destan belav dibe û nifş bo nifşî tête veguhastin.
3. Tomarkirin: di vê qonaxê da destan ji aliyê hunermendekî anjî pisporekî tête nivîsîn û tomarkirin.

Destan di nava xwe da wekî destanên xweristî û destanên çêkirî dabeş dibin. Destanên xweristî ji bûyerên kevin yên karîgeriyek mezin li ser bîra civakê hiştî pêk tên. Ev cûre gelêrî ne û danerê wan ne diyar e. Lewra wekî malê gel an netewekê tête hisabkirin. Gilgamişa Sûmeriyan, Kalavelaya Fîniyan an jî Memê Alanê Kurdan numûneyên vê cûrê ne. Destanên çêkirî jî jibo destanên ji aliyê helbestvanekî ve hatine çêkirin tête gotin. Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Bihuşta Wenda ya Milton em dikarin bo vî cûreyî wekî mînak bidin.




Destan bi sê awayan hatine honandin. Hinek menzûm (helbestkî), hinek pexşan hinek jî ji menzûm û pexşana tevlîhev hatine honandin. Di edebiyata Kurdî da destan li dû naveroka xwe dibin sê beş: Destanên mêrxasiyê wekî Destana Kela Dimdim, Şerê Kolana Qumriyê; destanên evînê wekî Memê Alan, Ferx û Sitî, Sînemxan; û destanên ayînî wekî Hespê Reş, Kekemîr, Avdel Ûmeran, Şêxmend, Zembîlfiroş.

# Şaredariya Til Temirê 23 projeyên xizmetguzarî amade dike

Hevserokê Şaredariya Gel a Til Temir Ridwan Xelef diyar kir ku 23 projeyên xizmetguzarî ji bo başkirina rastiya xizmetguzariya bajar û gundewarê wê hatine amadekirin û got, "Armanca ew e ku tevî hemû zehmetiyan, em karibin pêdiviyên welatiyan peyda bikin û aramiya xizmetguzariyê zêde bikin."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di çarçoveya şert û mercên ku herêm tê de derbas bû, şaredariya gel a bajarê Til Temirê pilanên baştirkirina rastiya xizmeguzarî li gorî îmkanên berdest berdewam dike, bi li benabûna destûrdayîna erêkirina Meclisa Rêveber û diyarkirina darayî ji bo projeyan.

Derbarê vê mijarê de hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Til Temir Ridwan Xelef ji rojnameya me re axivî û wiha anî ziman: "Hemû projeyên ku şaredariyê lêkolîn kiribûn û ji bo Meclisa Rêveber hatibû pêşkêş kirin hîn jî di miriyetê de ne. Di heman demê de nehatine rawestandin, lê li gorî îmkanên berdest û tedbîrên îdarî xebat li ser tên kirin.

**'23 projeyên xizmetguzarî hatine pêşkêşkirin'**

Ridwan Xelef da zanîn ku wan 23 projeyên xizmetguzarî berî ku bûyerên dawî li herêmê biqewimin bo Meclisa Rêveber bi armanca baştirkirina rastiya xizmetguzariya bajar û gundewarê wê pêşkêş kiribûn û wiha berdewam kir: "Ev proje sektorên girîng ên ku bandorê li ser jiyana rojane ya şêniyan dike di nav xwe de dihewîne, di destpêkê de



kanalîzasyon, ava vexwarinê, rê û bîr, wekî din xebatên xizmetguzarî yên girêdayî binesaziyê ne.

**Projeyên hatin pêşkêş kirin**

Ridwan Xelef wiha berdewam kir: "Ji projeyên herî girîng ên ku hatine pêşînyarkirin, ji nû ve avakirina tora kanalîzasyonê ye, ku avakirina wê vedgere zêdetirî 40 salî, ev yek dihêle ku ew hewceyî nûjenkirinek berfireh bibe, ji ber ku toreya heyî ji ber kevnbûna wê bandorê li ser karîgeriya wê dike, ev bû sedem ku şaredarî lêkolînek berfireh û yekgirtî amade bike da ku wê bi awayekî guncav ji bo nifûsa heyî û pêdiviyên berfirehbûna bajarî sererast bike.

Herwiha di pilana kar û xebatan de ji nû ve ziftkirina kolanên di nava bajêr û gundewaran de dihewîne, ji ber ku beşên mezin ji rêyan hewceyî sererastkirinê ne, ji ber sedemên karanîna dirêj û nebûna lênêrîn asayî a têrker di salên borî de."

Ji bo ava vexwarinê Ridwan Xelef wiha zelal kir: "Ji nav projeyên herî bingehîn kolandina bîrên nû ye ji bo peydakirina çavkaniyên avê yên berdewam, bi taybet piştî qutbûyîna di encama rawestandina depokirina avê ji stasyona Elok ji sala 2019'an ve. Şaredariyê bi awayekî cidî ji bo vê mijarê xebat kiriye, di rêya lêgerîna çareseriyên alternatîf da ku dabînkirina berdewam a avê ji şêniyan re misoger bikin. Projeya kolandina bîran gaveke stratejîk e ji bo baştirkirina ewlehiya avê li bajêr.

Di heman demê de pirên li hundirê bajarê Til Temirê ji bo parastina ewlehî û misogerkirina berdewamiya ewle ya trafîkê hewceyê xebatên nûjenkirin û lênêrînê ne. Lêkolînên teknîkî yên ji bo wan qediyane û proje di nav projeyên ku ji bo pêkanînê hatine pêşkêş kirin de ne.

**Berdewamiya kar û xebatan**

Ridwan Xelef diyar kir ku bûyerên ku vê dawiyê çêbûn nebûn sedema betalkirin an cemidandina projeyan û wiha got: "Lê şopandina îdarî û teknîkî berdewam kir di heman demê de li gorî îmkanên bedrest hin xebatên xizmetguzarî yên



meydaî hatin domandin. Şaredarî bi awayekî domdar kar û xebatan dike û erkê xwe nerawestandiye çi di warê paqijî, kanalîzasyon hem di ximetguzariyên rojane de.

Tîmên şaredariyê ji bo parastina paqijiya giştî û çareserkirina xirabûnên awarte yên di tora kanalîzasyonê de, ji bilî şopandina giliyên welatiyan û çareserkirina wan di çarçoveya çavkaniyên berdest de, xebatên xwe yên rotîn didomînin, berdewamiya pêşkêşkirina van xizmetan nîşan dide ku şaredarî tevî zehmetiyan jî pabendbûna xwe ya bi şêniyan re nîşan dide."

**'Xebat ji bo baştirkirina rewşa bajêr berdewam dike'**

Hevserokê şaredariya gel a bajarê Til Temir Ridwan Xelef wiha gotina xwe qedand: "Projeyên ku ji Meclisa Rêveber re hatine pêşkêşkirin li benda pejirandinên fermî yên dawî û diyarkirina fînansmana pêwîst ji bo her projeyekê ne. Yên herî bingehîn li gorî asta zirarê û bandora projeyê li ser jiyana şêniyan were destnîşankirin. Şaredarî dê projeyên ku herî zêde bi tendurîstiya giştî û xizmetên bingehîn ve girêdayî ne, destpê bike.

Şaredariya Gel a Til Temirê bê navber plana xwe ya xizmetguzariyê dimeşîne û xebat ji bo baştirkirina rewşa bajêr gav bi gav berdewam dike, armanca şaredariyê ew e ku tevî hemû zehmetiyan, pêdiviyên welatiyan peyda bike û aramiya xizmetguzariyê zêde bike."

# Aloziya Xazê barekî din li ser welatiyan zêde dike

**Jîn Hisên**

**Di rojên dawî de li bazaran xaza malê li çend bajarên Sûriyê rastî qerebalixiyek mezin û bilindbûna bihayê hatine, nemaze bihabûna fatûreyên elktrîkê û sînorkirina qidreta kirînê ya welatiyan ku barên giran li ser wan her ku diçe zêde dike, di vê çarçoveyê de heya niha çareseriyên guncav ne hatine dîtin.**

Di hefteyên dawî de aloziyeke kur di peydakirina xaza male de li herêmên hundirê Sûriyê hate dîtin, ku vê yekê bandoreke mezin li mabatan kir, bi taybet di hatina meha Remezanê de, vê yekê hişt ku dîsa bal bê kişandin li ser rastiya hilberîna xaza xwezayî û ya malê di welêt de.

Li Şamê û çend bajarên din ên Sûriyê, rêzên li ber navendên belavkirina xazê ji nû ve derketiye holê, di nava giliyên sivîlan de yên li ser zehmetiyên peydakirina qenîneyeke xazê. Li gorî



malperên li ser medyaya civakî û rûpelên fermî yên raghandinê bihaya hee qenînek xaz li bazara reş li hin deveran gihaştiye di navbera 200 hezar û 500 hezarên L.S. Di heman demê de bihaya wê ya fermî tenê nêzî 125 L.S ye, ku cûdahiyek mezin di navbera bihayê fermî û rastiya li bazaran de nîşan dide.

**Li her bajarekî bihayek**

Li Şamê û gundewarên wê gel zehmetiyeke mezin di peydakirina qenînê xazê de ji navendên belavkerên fermî dikşînin. Gelek malbat bi taybet xwediyên xweringehan neçar dimînin ku berê xwe bidin baraza reş, ku di bazarê de bihayê her qenîneyeke xazê 200 hezar derbas kiriye, di demekê de ku bihaya wê ya fermî 125 hezar L.S derbas nake.

Li Helebê heman rewşa Şamê tê jiyîn kirin, li bazara reş bihayê xazê di navbera 145 heta 200 L.S ye. Li parêzgeha Laziqiyê aramiyeke di bihayê xazê de heye ku bi nêzî 120 hezar L.S tê frotin, lê li Dêrazorê aloziyeke mezin tê jiyîn kirin. Li Hemayê bi awayekî giştî li bazara reş tê peydakirin û rêjeyek pir kêm li gel belavkerên fermî tê frotin.

**Daxuyaniyên fermî ya Wezareta Enerjiyê**

Ji aliyê xwe ve, Wezareta Enerjiyê aloziya xazê bi derengketina barkirinên xazê li bendera Banyasê ji ber şert û mercên hewayê û zehmetiyên lojîstîkî ve girêda. Herwiha piştrast kir ku dabînkirina xazê berdewam dike û dê di nava çend rojan de aramî vegere. Di heman demê de gihaştina tankerên nû yên xazê ji bo xurtkirina rezervên herêmî hate raghandin. Ji bo pêşîlgirtina li hember yekdestdarî û frotina li derveyî kenalên fermî, soz hat dayîn li ser tundkirina çavdêriya li ser bazaran.

Lêbelê, van daxuyaniyan nerazîbûna gel bidawî nekir, ji ber ku gelek kes dibînin ku daxuyaniyê fermî yên nakok derbarê sedemên aloziyê pirsên li ser mekenîzmeya birêvebirina rewşê û bandora tedbîrên kontrolê derdixin holê. Wekî din pêla hilanîna xazê ji ber fikaran kêmasî zêde kir û zextek zêdetir li ser dabînkirinê çêkir.

**Hêviyên çareseriyê û êşa berdewam**

Tevî nîşaneyên fermî yên başbûna dabînkirinê, aloziya xazê hîn jî barekî rojane li ser malbatên Sûrîyeyî nîşan dide, ji ber guherînên bihayê û zehmetiyên gihaştina kelûpelan, ku her çareseriyek rastîn bi belavkirina birêkûpêk û aramiya bazarê di rojên pêş de ve girêdayî dike.



# Di qonaxa yekemîn ya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de çi çêbû? (2)

Bi banga dîrokî ya Rêber Apo ku di 27'ê Sibatê de kiribû deng vedanekî li Rojhilata Navîn û Cîhanê kir. Dewleta Tirk ya ku hebûna Tevgera Azadiyê û gelê Kurd tune dihesiband û êrîşên qirkirinê pêkdianî, di 1'ê Cotmeha 2024'an de bi înîsiyatîfa Serokê MHP'ê Devlet Bahçelî û Rêber Apo pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk dest pê kir û ji gava ewil heya niha ku saleke derbas bûn. Ne siyaseta înkarê bi dawî bû, ne jî tecrîd rabû.

**Navenda Nûçeyan**

**Merasima Dîrokî ya şewitandina çekan**

Di 11ê Tîrmeha 2025an de Koma gerîla ya ku ji 30 şervana 15 Jin û 15 hevalên xort pêk dihat, bi pêşengtiya Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat, bi merasîmekê ku gelek sazî û dezgehên sivîl jî beşdar bûbûn de, li Şikefta Casenê ya gundê Surdaş a Dukanê ya bi ser Silêmaniyeyê dikeve bi merasîmeke dîrokî çekên xwe şewitandin. Ev biryar ji bo avakirina derfetên aştiyê neteweyî û navneteweyî wek geşedaneke dîrokî û fersendeke mezin hat nirxandin. Gelek dewlet li pey hev peyamên piştgiriyê dan û xwestin Tirkiye van derfetan ji bo çareseriyê baş binirxîne.

**Tehliye'ya Veysî Aktaş**

Di diroka îmraliyê de cara yekem girtiyeke siyasi hat tehliyekirin. Veysî Aktaş ê li Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Îmraliyê dihate ragirtin piştî 31 sal û 3 mehan hate berdan. Veysî Aktaş di 28ê Nîsana 2024'an de 30 sal cezayê hefsê yê lê hatibû birîn temam kiribû. Lê bi biryara Desteya Îdare û Çavdêriyê ya Girtîgehê, berdana Aktaş ji bo salekê hatibû taloqkirin. Piştî salekê berdana Aktaş ji bo 3 mehan hate taloqkirin. Aktaş ê ku berdana wî salek û 3 mehan hate taloqkirin di 25'ê Tîrmehê de hate berdan.

**Avabûna Komisyonê û gohdarkirin**

Piştê biryara xwe fesixkirinê û merasîma dîrokî ya şewitandina çekan, di 5ê Tebaxa 2025an de partiyên ku komên wan di Meclisê de hene Komîsyonek ji 52 kesan li Meclisê ava kirin. Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Netewî, li xwe kir û li ser 12 xalên bingeha xebata xwe diyar dike, li hev kir. Ev yek ji bo pêvajoyê wek qonaxeke qanûnî hat diyarkirin û civakê bi rêjeyeke mezin piştgirî da pêvajoyê. Komîsyona piştî civîna ewil wezîrên parastin, karên hundirîn û sîxurtiyê guhdar kir bi dorê sazî û dezgehên malbatên leşker û polîsên di pêvajoya şer de jiyana xwe ji dest dane, saziyên pîşesaziyê, saziyên bazirganan, Dayikên Aştiyê, saziyên malbatên gerîlayên di pêvajoya şer de jiyana xwe ji dest dane, saziyên girtî û hikûmxwaran, saziyên çand û ziman, akademîsyen, saziyên sivîl ên civakî, hunermend û gelek derdorên cuda yên ji ber şer û pevçûnan mexdur bûne û çavdêriyên wan çêbûne guhdar kir.

Piştê 6 salan parezer çûn îmraliyê

Piştê demeke dirêj cara yekem di 15'ê Îlona 2025'an parêzer Raziye Ozturk, Îbrahîm Bilmez û parêzer Cengîz Yureklî bi Reber Apo, Hamîlî Yildirim, Omer Hayrî Konar, Mahmut Yamalak û Ergîn Atabey yên ku li Girava Îmraliyê tên girtin re hevdîtin kirin."

**Tevgera Azadiyê ji Bakur vekişiyan**

Her wiha yek ji gava dîrokî jî ya





pêvajoyê vêkişîna Gerîlayan ji Bakûr bû. Rêveberiya Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê di 26'ê Cotmehê de bi daxuyaniyeke dîrokî li Qandîlê ragihand ku ji bo pêşî li pêvajoyê vekin hemû hezên xwe ji Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê vedikişînin. Piştî vê gava dîrokî hat gotin ku di pêvajoyê de xitimîn çêbûyê û ji bo ev xitimîn bê derbaskirin li ser înîsiyatîfa Rêber Apo, Tevgera Azadiyê hezên xwe vekişandin derveyî sînorên Bakurê Kurdistanê. Daxuyaniya Rêveberiya Tevgera Azadiyê li hemû cîhanê deng veda û weke gaveke pêşvêçûna pêvajoyê hat şîrovekirin.

**Çûyina komisyonê li gireva îmraliyê**

Endamên komîsyonê ku Serokwekîla Koma DEM Partiyê Gulistan Kiliç Koçyîgît, Cîgirê Serokê Giştî yê MHPê Fetî Yildiz û Cigirê Serokê Giştî yê AKPê Huseyîn Yayman pêk dihat di 24ê Mijdarê de çûn Girava Îmraliyê û bi Rêber Apo re hevdîtin pêk anîn. Ev hevdîtin jî di dîroka Kurdistan û Tirkiyeyê de cihê xwe girt. Rêber Apo li Girava Îmraliyê cara yekem ji bilî malbat, parêzer û endamên Heyeta DEM Partiyê ya Îmraliyê bi awayekî fermî bi endamên partiyên siyasî re hevdîtin pêk anî. Rêber Apo di hevdîtinê de li ser têkiliya gelê Kurd û Tirk a dîrokî rawestiya û xwest ji aliyê çar dewletên li ser axa Kurdistanê desthilatin hiqûq û mafê Kurdan bê naskirin. Lê Komîsyona Meclîsê ku di 4'ê Kanûnê de civîna xwe ya 19'emîn li dar xist, girtekên hevdîtina Îmraliyê hemû bi raya giştî re parvenekir û hîn cih qutkirin û bi vî wî awayî parvekirin. Ev yek di komîsyonê de bû sedema krîzeke û DEM Partî bertek nîşanî vê yekê da.

**Mafê hêviyê**

Rêber Apo wek sermuzakerevan pêvajoyê di şert û mercên zehmet yên girtîgehê de bi rê ve dibe. Daxwaza raya giştî ya Kurdistanê û Tevgera Azadiyê ew e ku Rêber Apo di şert û mercên azad de bixebite. Derbarê Mafê Hêviyê de herî dawî Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê di 17ê Îlonê de ji Tirkiyeyê xwest "gavên pêwîst ên bi lezgînî" biavêje û ji bo ku bi lez pêş ve biçe, herî dereng divê Tirkiye heta dawiya Hezîrana 2026'an bersiv bide. Her wiha Komîteya Wezîran a Ewropa vê carê îşaret bi Komîsyona Meclîsê kir û û ji komîsyonê xwest ji bo pêkanîna mafê hêviyê gavên pêwîst biavêje. Cîgirê Serokê MHPê Fetî Yildiz jî bi lêv kir ku mêfê hêviyê weke sernav tune ye û bi pêkanîna biryarên Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê mafê hêviyê dê pêk were. Mafê hêviyê dê di rapora hevpar de cih bigire an na, di Desteya Giştî de weke qanûn dê bê çêkirin an na ji aliyê raya giştî ve jî tê meraqkirin. Li bendê ye ku mafê hêviyê bi awayekî berdana bi şert di raporê de cih bigire û ev yek ji bo Rêber Apo jî pêk were.

**Qonaxa entegrasyona demokratîk**

Rêber Apo di 16ê Sibatê de li gel Heyeta DEM Partiyê ya Îmraliyê hevdîtin pêk anî û diyar kir ku merhaleya yekem a pêvajoyê bi dawî bûye û ew derbasî merhaleya duyemîn bûn e. Rêber Apo merhaleya nû ya pêvajoyê weke entegrasyona demokratîk pênase dike û bingeha wê jî Komara Demokratîk bi nav dike. Di pêvajoya entegrasyona demokratîk de Rêber Apo destnîşan dike ku divê qanûnên hemwelatîbûna azad bên çêkirin.

**Rapora hevpar û xebatên komîsyonê**

Komîsyona Meclîsê ku xebatên xwe 2 mehan dirêj kiribû tê gotin dê bi civîna 21'emîn a îro xebatên xwe bi dawî bike. Tîma nivîsîndina raporê jî di 6 civînên pêk anîbûn de li ser gelek xalan gotûbêj û nîqaş kirin. Di dawiyê de li ser çend xalan li hev kirin tune be jî raporek hevpar hat amadekirin. Ew rapora hevpar di civîna de wê ji aliyê partiyên siyasî ve were nîqaşkirin û piştî civînê li bendê ye ku rapora hevpar ji raya giştî re jî were parvekirin. Piştî derxistina rapora hevpar tê payîn komîsyonê xebatên xwe bi dawî bike û rapora hevpar jî bişîne Desteya Giştî ya Meclîsê. Piştî rapora hevpar derbasî Desteya Meclîsê bû li bendê ye pêşniyazên qanûnî yên di rapora hevpar de cih girtine weke qanûn werin çêkirin.

# ‘Yekrêziya partiyên Rojhilatê Kurdistanê pir girîng e, divê berfirehtir bibe’

**Hevserokê KNK’ê Ehmed Karamûs da zanîn ku yekrêziya partiyên Kurdî yên Rojhilatê Kurdistanê di rewşeke hestyar û amadekirina êrişan li ser Îranê pir girng e, lê divê ji wiha berfirehtir bibe û got, “Li ser asta Kurdistanê pêdivî bi rêkeftin û pêkanîna kongreyeke niştîmanî heye.”**

Reşo Mihemed

Di 22’ê Sibatê de 5 partiyên siyasî yên serekî yên Rojhilatê Kurdistanê ku ji Partiya Demokratîk ya Kurdistanê-Îran, Partiya Jiyana Azad ya Kurdistanê (PJAK), Sazmanî Xebata Kurdistanê-Îran, Partiya Azadî ya Kurdistanê (PAK), Komeleya Zehmetkêşan ya Kurdistanê ‘Hevpeymaniya Hêzên Siyasî ya Kurdistanê ya Îranê’ ragihandin. Derbarê heman mijarê hevserokê KNK’ê Ehmed Karamûs bersiva pirsên rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû:



**-Di demeke ku Îran û Rojhilatê Kurdistanê di metingeha şoreş û serhildanê de ye, yekrêziya 5 partiyên Kurdî yên Rojhilat pêkhat, di vê serdemê de ev yekîtî tê çi wateyê?**

Di destpêkê de ez dixwazim pîrozbahiyê ji bo yekhelwestiya her pênc partiyên Kurdî bikim, ji ber ku ev partî di rewşeke hestyar de yekrêziya xwe ava kirin. Di dema ku guhertin li Rojhilata Navîn tên kirin û amadekariyên pêkanîna êrişa li ser rêjîma Îranê de, yekbûna partiyên Kurdî yên Rojhilatê Kurdistanê derkete pêş. Di rewşeke wiha hestyar de jî pêwîstiya tevgera Kurdî bi yekrêziya xurtir heye, em kêfxweş in bi yekbûyîna her pênc partiyên siyasî yên Rojhilat, lê hêviya me ew e ku partiyên tevlî vê yekrêziyê nebûbin, êdî bi wan re bibin xwedî helwestek istratejîk û yekbûyî, hem jî hevrêziya xwe xurttir bikin. Divê tevahiya partiyên Kurdî yên li Rojhilat bi hev re bibin hevkar û roleke baş bilîzin ev yek jî li gorî guhertina ku wê Îran rastî wê were, hem jî. Wekî tê zanîn di 26’ê Nîsana sala 2025’an de Konferansa Yekhelwestiya Kurdî weke konferanseeke niştîmanî ji bo doza Kurdî li Rojava hat lidarxistin. Li Rojhilatê Kurdistanê jî ev nîzîkatî di nava partiyên Kurdî de rûdide, ev yek cihê şanaziyê ye. Yekrêziya li her du beşên Kurdistanê çêbû, konferans li dar ketin, êdî divêtiya Başûr û Bakurê Kurdistanê heye ku konferansên yekhelwestiya Kurdî li dar bixin. Pêdiviya me li ser asta Kurdistanî bi rêkeftin û pêkanîna yekîtiya niştîmanî heye, yekbûna partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê di heman çarçoveyê de pir girîng e.

**-Heta niha çima kongreyeke niştîmanî ya Kurdistanî çênebûye, sedem çi ye û yekbûna helwesta partiyên Rojhilat gaveke çawa diafirîne ji bo lidarxistina kongreya giştî, herwiha rola KNK’ê di vî warî de çi ye?**

Sedemên nepêkanîna kongreyeke netewî ya Kurdî gelek in, ji serdemên borî heya roja îro gelek gengeşe û alozî di navbera me Kurdan de çêbûbûn. Sedema ku em negihiştine wê encama ku kongreyeke niştîmanî Kurdî bi beşdariya hemû sazî, rêxistin û partiyên Kurdî çêbikin, ew e ku me nikarîbû xwe li hev kom bikin û vê hevrêziyê bi dest bixin. Em ji kongreyê gelekî dereng mane, nimûne eger li Rojava gelê Kurd û partiyên siyasî ji destpêka şoreşê ve xwedî istratejiyeke Kurdî ya hevbeş ba, ew ê rewşa Rojava ji ya îro baştir ba. Di heman demê de rewşa Îraqê li ber çavan e, li Başûrê Kurdistanê weke mînak em bêjin nêzî sal û nîv li ser hilbijartinên parlemento derbas dibe, hêzên siyasî li Başûr hîna civîn ji bo bidestxistina yekhelwestiyê û parastina berjewendiyên niştîmanî li dar nexistine. Me erk û berpirsyariya niştîmanî wekû tê xwestin ruxmî derfeta ku di destê me de heye, pêkneaniye. Em weke KNK’ê bi israr û rengekî cidî li ser yekrêziya mala Kurdî, hem jî lidarxistina kongreya niştîmanî, kar kiriye. Kongreya Neteweyiya Kurdistanê bi awayekî objektîv mijara yekrêzî û pêkanîna kongreya niştîmanî dide pêşiya çavê her kesî. Di vê qonaxa gelekî hestyar de pêwîst e bi heqîqet mijara yekhelwestiyê û destkeftiyên gelê Kurd di rojevê de bihêlin. Di roja heyî de em rû bi rû mane li hemberî tehlûkeyên mezin, eger em di demeke wiha de û demeke nêzîk yekrêziya xwe pêkneyînin, hebûna me û destkeftiyên me di metirsîdariyeke mezin de ye. Divê pirs, pirsgirêk, gengeşe û hemû tiştên neyîniya xwe li yekrêziyê dike, em bidin hêlekê û em li ser xurtkirina hevrêziya Kurdî, hem jî kongreya netewî kar bikin. KNK’ê xwedê pilaneke cidî û hewldanên mezin e, ew ê pêngavên me hebin da ku kongreyeke giştî li dar bixin.

**-Di dema heyî de siyaseteke çawa li ser gelê Kurd tê meşandin, gelê Kurd û partiyên siyasî çawa li vê siyasetê dinerin, heyanî gelê Kurd mafê xwe misoger bike divê gavên çawa bavêje?**

Siyaseta ku îro li hemberî gelê Kurd tê birêvebirin, siyaseta qirkirinê û têkbirina statûya Kurdan e. Armanca her çar dewletên dagirker Îran, Îraq, Sûriye û Tirkiyê ew e ku li statûya gelê Kurd li Rojava û Başûrê Kurdistanê ji holê rakin. Siyaseta dagirkeran li hemberî Kurdan ne tenê ji bo beşeke Kurdistanê ye, hemû dewletên dagirker bi dirêjahiya sedsalî bi hemû hêza xwe qirkirin, komkujî, koçberkirin, Anfal, bikaranîna çekên cehrî û hwd, li gel şerê nasnameyê li derheqê gelê Kurd pêkanîne. Gelê Kurd siyaseta dewletên dagirker bi vî rengî dibîne û dixwîne. Di demên dawî de hin gengeşeyên ku berjewendiyên gelê Kurd naparêze derketin holê, dijmin bi zanebûn vê yekê dixe nava gelê Kurd, divê em provakisyon û siyasetên wiha vala derxînin. Divê em berjewendiyên gelê xwe yên niştîmanî biparêzin, herwiha em rûyê kesê ku dibe sedem ji derxistina pirsgirêkan di nava gelê Kurd de bidin diyarkirin ji bo civakê. Em bang li hemû sazî, rêxistin û kesayetên netewperwer dikin ku demildest em hebûna xwe biparêzin, yekîtiya xwe peyda bikin û yekrêziya netewî bixin rojevê, ji ber ku hemû alî û tevahiya gelê Kurd vê yekê dixwaze. Divê em gelekî baş ji peyama gelê xwe têbigihêjin, eger em tênegihêjin, em ê bikevin bin bar û berpirsyariyeke giran, hêviya me ew e ku ev yek nebe para me, lê belê omîd ew e ku yekrêziya gelê Kurd û istratejiya hevbeş pêkwere. Çendîn KNK’ê hebe û kar dike, gelo Kongreya Netewiya Kurdistanê bersiva pirs û pirsgirêkên me didin an na? Di baweriya me de ev ne têrker e, pêwîstiya me bi kongreyeke netewî heye, kongreyeke ku xwedî istratejiyek be, tê de hemû rêxistin, partî û kesayetên niştîmanperwer beşdar bibin. Di heman demê de hemû kesên beşdar ên di kongreyê de ji tevahiya cîhanê re projeya xwe ya hevbeş bidin diyarkirin. Berê digotin zemîn ji bo yekrêziya Kurdî re tuneye, lê di roja îro de ew dem derbas bûye, Kurd vê yekê baş dizane û dijmin jî baş dizane. Pêwîst e em di asta navdewletî de, hevalbend û piştgiran bi riya kar û xebata dîplomatîk çêkin. Divê gelê Kurd di nava xwe de li gorî merc û rewşa siyasî ya herêmê bibin yek, zemîna hevrêziyê heye, tu buhane nemane ku nebin yek.

# Rast xwendina Peyama Rêber Apo

E.Pêjder Altan

Di salvegera destpêkirina pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” a ku Rêber Apo di 27’ê Sibata 2025’an de dabû dest pê kirin, bi riya şandeya Îmralî û Partiya Dem’ê peyamên girîng da û qonaxek nû da destpêkirin.

Di peyamê de çend taybetmendiyên krîtîk derdikevin pêş;

Lihevhatî û ewqas jî bi biryar e. Peyam, ne zimanekî ku şer li dewletê vedike, zimanekî ku formeke nû bi dewletê re pêşniyar dike bi kar tîne. Lê belê ev nermî, ne wekî paşde gavavêtin e, lê wekî hilbijartinek ku ji pozîsyona hêzê hatiye kirin tê pêşkêşkirin. Hevoka “Me serdema îsyana negatîf (neyinî) di bingeh de me bi îradeyek û pratîk bi awayek yek alî biserxist” vê yekê bi zelalî derdixe holê.

Gotina “Bi hişmendî bi komarê re aştî” pir stratejîk e. Komarê red nake lê wê wekî “Komara Demokratîk” ji nû ve pênase dike. Ev, qebûlkirina meşrûiyeta damezrandina dewletê ye lê daxwaza veguheztina an go guherîn û veguherîna naveroka wê ye. Peyam ne tenê ji Kurdan re, ji tevahiya Tirkiye û Rojhilatê Navîn re dibêje. Gotina “Mafên hebûna hemû mexdûran”, mijarê ji pirsgirêka Kurd wêdetir dibe.

Tevgera gotarî ya herî bi hêz a peyamê, daxuyaniya ku şiddet ne tenê bi fîîl lê “bi hişmendî” jî hatiye terkkirin e. Ev, peyamê dide aliyê din ku “êdî behane-hincet nemaye.”

Ji gelê Kurd re; Motîvasyona “Me ev gav avêt, niha dema avakirina pozîtîf e”

Ji raya giştî ya Tirk re: Piştraste “Em dijmin nînin, em bi komarê re aştî dikin”

Ji dewlet/desthilatdariyê re: Zexta “Me kapasîteya muzakereya xwe îspat kir, niha dora we ye”

Ev daxuyanî ku di salvegera yekem a banga 27ê Sibatê de hatiye kirin, çend fonksiyonên stratejîk pêk tîne: Zindîhiştina pêvajoyê; Rêber Apo destnîşan dike ku di nav salekê de pêvajo bi fîîlî pêş ketiye lê hîn bi destkeftinên şênber nehatiye tacîdar kirin. Banga “divê em derbas bibin qonaxa pozîtîf” bi rastî peyama “salekê ye me gelek gav avêtin, em li benda refleks an jî hewildanê ne” ye.

Rêber Apo, rêzkirina navên aktorên siyasî yên wekî Tayîp Erdogan, Devlet Bahçelî û Ozgur Ozel jî ne tesadufî ye.

Danîna “îrade” ji Erdoğan re: Pejirandina ku pêvajo bi erêkirina îradeya siyasî ya herî bilind ve tê meşandin. Ev, tevgereke ji bo garantîkirina pêvajoyê bi siyasî ye.

Navkirina Bahçeli: Xêzkirina binê ku pêvajo ji aliyê MHP ve jî tê xwedîkirin (an jî herî kêm banga Bahçeli cidî tê girtin). Ev, qada dijberiya beşa neteweperest li hember pêvajoyê teng dike.

Dahilkirina Ozgur Ozel: Qebûlkirin ku partiya opozîsyona sereke CHP jî di pêvajoyê de cihekî heye. Ev, hewldana nîşandanê ye ku pêvajo ne projeyek yek-partî ye.

Çarçoveya têgînî ya ku stûna peyamê pêk tîne formulasyona “derbasbûna ji qonaxa negatîf bo avakirina pozîtîf” e: Qonaxa negatîf çi ye? Têkoşîna çekdarî, serhildan-isyan, tundî-şîdet, qûtbûn an jî veqetandin û redkirin. Beranberê van qonaxa pozîtîf çi ye? Siyaseta demokratîk, entegrasyon, hiqûq an jî destûra bingehîn, hevjiyana bi hev re, veguheztin an go guherîn û veguherîn.

Di peyamê de têgîna “Entegrasyona Demokratîk“ jî xala herî orjînal û herî nîqaşbar a peyamê ye.

Ne veqetandin û ne jî asîmîlasyon (bişaftin): Rêber Apo van her du rehan jî red dike. Ev, pozîsyonek e ku hem daxwazên serxwebûnê yên di bingeha Kurd de hem jî gotara “yek milet” ya dewletê di heman demê de dike berberî xwe.

Gotina “Bi qasî destpêka Komarê girîng” pir îdîadar e. Rêber Apo, modela ku pêşniyar dike wekî momentek dîrokî ya ku bi damezrandina Komarê re wekhev e pêşkêş dike.

Daxwaza ku entegrasyona demokratîk bi garantiya hiqûqî ve bê garantîkirin, sinyala ku pêvajo divê ji qonaxa “daxuyaniya niyetê” derbas bibe qonaxa “avakirina sazûmanî”.

Têgîna hemwelatîbûna li ser bingeha etnîk ya di pergala destûrî ya heyî de red dike. Li şûna wê modela welatîbûna sivîl-demokratîk pêşniyar dike.

Ev, ne tenê bi pirsgirêka Kurd ve sînordar e; çarçoweyek e ku hemû aliyan, kêmaran û hemû komên nasnameyan digire navxwe.

Di peyamê de wek e hercar girîngiyê dide ser hêza jinê. Lewra girêdaneke dîrokî dike: “Şiddeta li dijî jinan ne wekî pirsgirêkeke rojane ya veqetandî, lê wekî berdewamiya êrişeke dîrokî ya ku bi koletiya jinê dest pê kiriye pênase dike. Ev nêzîkatî, pirsgirêkê ji çarçoweya “bûyerên takekesî” derdixe û dide nav çarçoweya pergaleke desthilatdariyê.

Pênasekirina jinan ne tenê wekî “mexdûr” an “qurbanî”, lê wekî “hêza pêşvebir û herî azadîxwaz a entegrasyona demokratîk” gaveke girîng e. Ev, jinê ji pozîsyona “kesê ku divê bê parastin” derdixe û dike sûjeya veguheztinê. Di vê wateyê de Rêber Apo, di çarçoweya ramanê xwe de, jinê ne tenê wekî beşdarvaneke pêvajoyê, lê wekî pêşengiya veguheztina civakî bi cih dike.

Rêber Apo bi gotina “tu civak û dewlet nikare bêyî guhdarîkirina jinan xwe bidomîne“, girêdaneke rasterast di navbera desthilatdariya mêrane û dewletê de saz dike. Ev tê vê wateyê: Dewleta ku azadiya jinê red dike, bi xwe jî demokratîk nabe.




# ‘Şano dibe dengê bêdengan û rastiya civakê derdixe ser dikê’

**Şanoger Simko Cûdî anî ziman ku ew pirsgirêkên ku mirov pê re rûbirû dimînin temsîl dike û wan vediguherîne berhemeke hunerî ku raman û hizrandinê dide destpêkirin. Bi afirîneriya xwe, ew hewl dide ku neheqiyê eşkere bike.**

Hêvî Keleş/Qamişlo

Pir caran, pisporên şanoyê yekem kes in ku bi pirsgirêkên civakî û siyasî re rûbirû dimînin û şanoyê wekî amûrek ji bo derbirînê û protestoyên aştiyane bikar tînin. Şano dibistanek jiyanê û platformek ji bo belavkirina hişyarî û ronakbîriyê bûye û berdewam dike, nemaze di civakên ku qeyran an pevçûnan dijîn.

Di cîhana hunerên performansê de, lîstikvanê şanoyê kevirê bingehîn ê xebata şanoyê ye, navbeynkarê zindî di navbera nivîs û temaşevanan de ye, ruhê ku jiyanê dide peyvên bêcan. Tevî pêşketinên teknolojîk ên mezin di hunerên dîtbarî de, şano hîn jî formeke hunerî ya bêhempa ye ku bi bingehîn li ser performansa zindî û têkiliya rasterast ava dibe, taybetmendiyek ku cîhekî îstîsnaî dide lîstikvanê şanoyê di warê çandî de. Girêdayî vê mijarê Şanoger Simko Cûdî ji Rojnameya me re axivî.



## ‘Em jiyanê li ser dike diafrînin’

Şanoger Simko Cûdî diyar kir ku jiyana mirov bi hunerê teşe digire û wiha got: “Dema ku mirov bi karekî hunerê re mijûl dibe di fikir û zikir û çalakiya wî mirov de şênberbûna rêya ku tê de dijî diyar dike, nexasim di nava gelekî de be ku xwe bi mîrasiya xwe ya çandê û hunerê parastibe derketive holê, lê parastin rengekî mayîndekirina gelekî ye di heman demê de ne têrkere. Nujînkirin, vejandin û pêşdebirin ew dihêle ew gel were parastin û domandina wî bi destdixe di heman demê de mayînde dike. Ez behsa gelê Kurd û hunera wî gelî dikim, berî Tevgera Azadiyê gelê kurd xwe bi hunerê parast û domand, bi Tevgera Azadiyê re hebûna xwe bidestxist, vejand û pêşdebir, taybet di warê çandî û hunerî de.”

## ‘Şano dibe dengê bêdengan û rastiya civakê derdixe ser dikê’

Simko Cûdî axaftina xwe wiha qedand: “Ez wek kesekî ji hundirê şoreşê beşdarî xebatê hunerî bûm û taybet şano, çima beşê hunerê yê şano min ji bo xwe bijard? Ji ber ku şano ji bo avakirina kesayetekî li gorî hêmana exlaqî û polîtîk yê civakekî cihê avakirina kesayetê ye herwiha dibê dengê bêdenga yan jî rastiya civakê derdixe ser dikê bi van sedeman, min ji xwe re ev huner bijart.

Di sala 2013’an de min dest bi karê şano kir wê demê ez 15 salî bûm li bajarê rimêlan di koma şehîd Hêvî de heta sala 2017’an de min li wir karê şanoyê da meşandin. Piştî tevlîbûna min ji Tevgera Azadiyê re nêzî 3 salan min xebatê şano li qadên civaka Ereb dan meşandin Til Hemîs, Til Birak û di sala 2021’an de heta niha di nav şanoya çiya de karê şanoyê didim meşandin, ji dema nugihştbûna min heta niha ez di nava xebatê şano de me. Şanoyên ku min te de kar kirye: Kursî, birîn, jiyan ji mirinê avadibe, evina welat, vejîn, termî li ser resîfê, evdalê zeynikê, agir û tarî, rastî dagirkirê, dika heqîqetê, keziyên jînê, riya jînê, wê rojê, çakûç, koça qaqlîbazim bêjahî, wêne, di van kar de hinek jî lîstikvan min kiriye û hinek jî derhinertî û nivîsandin kirye.

ji bo wê şano ji bo min bûye wek xwîna ku di hindirê mirov de diherikê. Ez ancax bi vî rengî wateyekî bidim ji bo şano, armanc di şano de ji bo min ne tenê lîstikvaniye, yan nivîsandine yan ji derhinerî ye, ew rihê komînalbûnê ye û dengvedana ku ji bo civakê tê çêkirine.”

# Meha rojiyê sebra mirov zêde dike

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Hevserokê Ol û Bawerî Mistefa Hacî diyar kir ku rojî tê wateya bereket û îbadetê, mirov ji aliyê nefsî, xwerin û vexwerinê de hem jî ji axaftinên nebaş xwe perwerde dikin û wiha got: “Meha rojiyê sebra mirov zêde dike û dilovaniyê dixe dilê me de.”**

Meha rojiyê meheke ku xweda ferz kiriye li ser misilmanan ku 30 rojî mirov ji berbanga sibê heya ku roj here ava xwe dûrî xwarin û vexwarinê dike. Di heman demê de feqîr û zengîn wek hev lê tên di vê mehê de. Mirov nêzî xwedê dibe û têkiliya wî xurt dibe.

Di derbarî meha rojiyê girîngî û wateya wê hevserokê olû bawerî ê bajarê Dêrikê Mistefa Hacî ji Rojnameya me re axivî.

## ‘Rojîgirtin stûnê çaremîn a islamê ye’

Mistefa Hacî da zanîn ku gelê misilman ji nîvê meha Şaibanê dest bi amadekariyên meha remezanê dikin û wiha got: “Gelê misilman meha rojiyê wek meheke bereket û îbadetê dibînin, di serdan û xêrxwaziyê de jî zêdebûneke berçav çêdibe. Dema roj diçe ava kesê rojî girtî, rojiya xwe bi xurme û avê dest pê dike, rojane divê xwarin ji malê derkeve da ku bereket bikeve di wê malê de. Di heman demê de mizgeft bi ibadetkaran tê dagirtin û hemû civak bi hev re terawîhan dikin, ev kombûn ji bo bîranîn û nêzîkbûna xwedê ye. Rojîgirtin stûnê çaremîn a islamê ye ku mirov bi riya wê pirtûka pîroz dixwîne, nimêjên xwe zêdetir dike, xêran dike û têkilya xwe bi xwedê re nû dike. Destpêka rojiyê dilovaniye, nîva wê bexşandine û dawiya wê rizgarbûna ji agirê dojehê ye. Di vê mehê de malbat bi giştî li ser yek sifreyê li hev dicivin û dest bi xwarinê dikin, ev yek dihêle ku rihê malbatî û kombûnê vejîn bibe. Di heman demê de xemxwarî ji bo feqîr û hejaran zêde dibe û destên alîkariyê pir dibin.”

## Pêwîste mirov di vê mehê de destekê bide feqîran

Hacî axaftina xwe dewam kir û got: “Ev meh cûdahiyeke wê ji wan mehê din heye, ji ber ku mirov derûniya xwe hazir dike û bernameyeke taybet ji vê mehê amade dike ku xwarin, vexwarin û çûn û hatina xwe hemûyî diguherîne. Her wiha gelek malbat hene bi salan bi hev re narûnin lê di vê meha rojiyê de hemû li hev dicivin û bi dilekî paqij da ku rojiya wan were qebûl kirin. Pêxember Mihemed gotiye çi kesê ku di vê mehê de têkiliyên xizmetiyê biparêze, roja ku xwedê bi wî re hevdîtinê çêbike wê wî bi dilovaniya xwe ve girêbide. Di heman demê pêxember gotiye xêrxwaziyê bidin feqîr û hejaran û rêzgirtina sîwiyan û parastina rûmeta wan bikin. Pêwîst e mirov di vê mehê de bi niyetek rast û xwedî bawerî nêz bibe.”

## Erkê ewqafê destekdayîna hejara ye

Serokê Saziya Ol û Baweriyan li bajarê Dêrikê Mistefa Hacî axaftina xwe wiha bidawî kir: “Erkê me ye ku em alîkariya feqîr û hejaran bikin û bi taybet di meha rojiyê de. Lê piştî bicihbûna koçberan



di dibistan û mizgeftan de erkê me zêde bû, ji ber ku em şev û roj di bin xizmeta wan de bûn da ku ji wan re pêdiviyên wan peyda bikin, di meha rojiyê de jî em xwarinê didin wan. Her wiha di vê mehê de her în ewqaf mijarekî cûda digre dest û ji bo gel şîrove dike da ku girîngiya vê mehê nas bikin, li kêlek wê em serlêdana gelek malbatan dikin da ku em kêmasiyên wan nas bikin û pêk bînin. Meha remezanê pîroze çiqasî mirov têde kar bike xêra wê mezintire, bi taybet xizmeta feqîr û hewcedaran.”



## Meha Remezanê

Hafiz Ahmet Turhalli

Meha Remezanê li welatê me bi taybetî û cihana Îslamî bi giştî weke hevkariya mirovên muhtac dihatin pêşwazî kirin.

Ew meh ligor Qur’ana pîroz wateyekî xweya taybet heye.

Ligor Wehyê ev meh jibo kû Qur’an têde daketiye cudabuna wê ji mehên dîtir heye. Ligor Qur’ana pîroz ev pîrozahî weha tê şîrove kirin:

“Ev meh kû têde Qur’an hatiye nazil kirin, çewtî û rastî jinava hev hatiye derxistin û cûda kirin, kî ji we bigîhîje vê mehê bira rojiyê bigre. Ger rêwî anjî nexweşbe, bira li gorî wan rojan piştre rojiya xwe bigre. Xwedê jibo we hêsaniyê dixwaze, zehmetiyê naxwaze”. (Beqere 185)

Ligor Qur’anê di meha Remezanêde ew kesên mêjiyên wan nezelal, rastî û çewtiyan nav hev dixin, ligor nefsa xwe dimeşin, divê ligor heqîqeta Rawîşt (exlaq) û hizrekî paqij dest bi jiyanekî nuh bikin.

Lewre Remezanêde, banga rastiyê tê kirin. Divê destpêkê mirov bixwere rastbe, piştre bi Xwedayê xwere rastbe û pişrtejî bi derûdora xwere rast bimeşe.

Dema Qur’an daket civaka Mekkê civakekî Bawermend bu. Nimêj dikirin, Rojî digirtin û Hec jixwe 4000 hezar sal bu hebû. Pirsgirêka wê demê, xapandina civakê binavê ol bu.

Destwerdan liser wan kesayetên xapandina civakê dikir hate pêşxistin û tekoşîn dinavbera wan kesayetên xwînmijiya civakê dikir û Pêxemberde bu.

Jiber destpêka vê şoreşê di heyva Remezanêde bi fermana “bixwîne” destpêkir, pêşwazîkirina wêjî cûda dihat kirin.

Gotina destpêkê yê tekoşîna Îslamê bixwîne, ya duyem rabe derudora xwe hişyar bike, rastiyê bi dengekî xurt bilind bike û dij van oldarên sexte rastiyan eşkere bike.

Jibo ev dengê rastiyan were tepaser kirin, desthelatên wê deme hemû hêzên xwe seferber kirin.

Rûxmî hemû êrîş û zordariyan jî, dengê heqîqetê her çû bilindtir bu.

Îslamê got; bi zikê birçî lê bi hişmendiyekî paqij û vijdanekî bilind xwe nujen bikin.

Divê kesê vê mehê pêşwazî dike, jibo dadmendiya civakî bi cîh bike xwedan helwest û tekoşînêbe. Ev kesayet jibo başî dinava civakande serdest bibe û belengazî, feqîrî, hemû cureyên neheqiyê ji holê rabe, xwedî liv û tevgerbe.

Îro dinav civaka me misliman de, kuştin, malwêranî, dizî, xapandin, derew, îftîra û tiştên Qur’anê qedexene, di jiyana mede bicîh bune.

Gelo pêşwazî kirina Remezanê, tene cîh guhertina xwarinêye?

Ger di heyva Remezanêde, tiştên Qur’anê qedexe kirine di jiyana mede weke taybetmendiyan berdewam bin, em çima ewqas Qur’anê dixwînin û xwe birçî dihêlin? Ger em Qur’anê di heyva remezanêde dixwînin û di Mizgeftande gohdariya Melayan dikin, lê nebaşî di jiyana xwede sînordar nakin, sedemên xwe yên bingehîn çine?

Xwedê dibêje me di meha Remezanêde ev Qur’ana nazil kir û dê ew wê rastî û çewtî di jiyana wede zelal bike. Ger fermana Xwedê evbe, bandora wê di jiyana me Misilmanande çiqase?

Alîkariya bindestan, hêjaran, muhtacan, mezluman fermana Xwedêye; pêkanîn û sererastkirina wanjî erka bawermendên Îslamêye!

Ger ev sîstema xirab her diçe kurtir dibe, wê deme em pêşwaziya kîjan Remezanê dikin?

Dinava me Kurdan de berê meha Remezanê jibo cînar û derudoran, meha hevkarî, alîkarî û merhemetê bu. Neha mejî ew Remezanên berê terikandine û lipey Remezana dewlet û desthelatan kaş dibin.

Divê em vê Remezanêde xwe nuh bikin, hevkarî, alîkarî û xwedîderketina heqîqetê pêşbixin.